**K.T.**

**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ**

**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

TEZA
LÎSANSA
BILIND

# XEMILANDINA FELSEFEYA OLDARIYÊ DI HELBESTÊN MEHWÎ DE

HAWKAR HAIDER FARHAN

ŞAXA MAKEZANISTA
ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

RÊBENDAN 2017

ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

**Teza Lîsansa Bilind**

# XEMILANDINA FELSEFEYA OLDARIYÊ DI HELBESTÊN MEHWÎ DE

**Hawkar Haider Farhan FARHAN**

**14950001076**

**Şêwirmend**

**Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ**

**WAN-2017**

**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTRESİ**
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Yüksek Lisans Tezi**

# MEHWÎ'NIN ŞİİRLERİNDE DİN VE FELSEFE

**Hawkar  Haıder Farhan FARHAN**

**14950001076**

**Danışman**

**Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ**

**VAN – 2017**

**ETİK BEYAN SAYFASI**

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında (Xemilandina Felsefeya Oldariyê Di Helbestin Mehwî de) ;

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

**Hawkar Haıder Farhan FARHAN**

15.01.2017

# NAVEROK


*KURTE* ...... *VI*

*ÖZET* ...... *VII*

*ABSTRACT* ...... *VIII*

*PÊŞGOTIN* ...... *IX*

*KURTEBÊJE* ...... *X*

*DESTPÊK* ...... *1*

*1. Felsefe û Tesawif Oldarî di alîyê Hişmendî, Peyv, Pênase, Armanc û Encamê de* ...... *2*

**1.1.1 Armanca Felsefê** ...... **2**

**1.1.2 Taybetmendî û Bingeha Felsefê** ...... **3**

**1.1.3Pênaseya Felsefê** ...... **5**

**1.2 Tesawif (Oldarî)** ...... **7**

**1.2.1 Pênaseya Tesawifê (Oldarî)** ...... **8**

**1.2.2 Rêyên Cuda Cuda Yên Tesawifê** ...... **10**

*Soran Mehwîdi teza xwe de sofîyan dike du beş* ...... *13*

**1.2.3 Felsefeya Tesawifê (Oldarîyê)** ...... **25**

**1.3. Terîqatcî û Hizir û Fikrê Felsefeya Tesawifê** ...... **26**

**1.3.1 Rêbaza Mensor Helac û Bawerîya Wî** ...... **26**

**1.3.2 Rêbaza İbn Ereb û Bawerîya Wî** ...... **27**

**1.3.3 Felsefeya Eflaton û Bawerîya Tesawifê** ...... **27**

**1.3.4 Bawerîya Muetezbil û Cabrî Li Ser Azadîya Mirovan DiÇêkerê De** ...... **27**

**1.4 Pênaseya Helbestê** ...... **28**

**1.4.1 Zimanê Helbestan û Zimanê Helbestên Mehwî** ...... **30**

**1.4.2 Kurteyek Di Derbarê Jîyana Mehwî De** ...... **32**

*2. MehwîûTesawif* ...... *34*

**2.1. Mehwî û Tevlîbûna Wî a Bi Tesawifê Re** ...... **34**

**2.1.1 Mehwî û Tevlîbûna Wî a Bi Felsefê Re** ...... **41**

**2.1.2 MehwîDinava Tesawifê De** ...... **43**

**2.2 Mehwî û Tesawifa Îslamî û Rêbazên Cuda Cuda Yên Tesawifê** ...... **44**

**2.2.1 Mehwî Ji Ehlê (Hedîp) e Ser Bi Bawerîya Eşarî Ye** ...... **45**

**2.2.2 Mehwî Terîqeta (Mewlewî) û Bawerîya (Mewlena Celadînê Romî)** ...... **45**

**2.2.3 Mehwî û Terîqeta Neqşîbendîyê** ...... **46**

**2.2.4 Mehwî û Cabrîyet Bawerîya Cabrîyan ........................................................................ 47**

**2.3 Mehwî û Felsefeya Tesawifê ........................................................................................ 48**

**2.4. Mehwî û Yekîtîbuna (Eflatonî) Yan (İbn Ereb) ........................................................... 48**

**2.4.1 Mehwî û Yekêtî bûn a İbn El Ferac ........................................................................... 50**

**2.4.2 Mehwî û Tekçûna Helac ............................................................................................ 51**

**2.4.3 Mehwî û Dijyayetîya Wî Beramber Bawerîya (Muetezîlî û Cabrîyan) ........................ 51**

**2.4.4 Mewî û Rabîey Eddedî .............................................................................................. 52**

***3. Ji Dîwana Mehwî.......................................................................................... 53***

***ENCAM ......................................................................................................... 60***

***ÇAVKANÎ ....................................................................................................... 61***

## KURTE

Qala felsefe û tesawif di alîyê pênase û peyvande hatîye kirin.Piştre min qala felsefeya Tesawifî (Oldarî) kirîye û hewilmdaye mînakan ji bîr û bawerîya felsefeya tesawifan bînîm, bi taybetî ewên li cem Mehwîne.Beşa DuyemDi vî beşî de jî kokirinek di rîya helbestên mehwî de jî hatîye kirin. Qala Tesawif û felsefeya Tesawifê jî kirîye. Zêdetir min hewildaye ez bixwe çawe jê fêmdikim û qal bikim û Şîrove bikim. Encamek bi belgeyên pêwîst rast yê fikrê xwe her dinava helbestên mehwî de bidim dîyar kirin.Beşa SêyemBeşê sêyem jîji dîwana Mehwî çend rêzikên helbestê û wateya helbestan, berhevkirina çîrokên dildarî yên dinavbera aşiq û meşiqande hatîye çêkirin. Aşiq mehwîye û maşiq jî ew kesa ku jêre hatîye nivîsandine. Ev jî wekî dahênanekî di mejîde hatîye. Min xwest divê rêyê de ez bi xwêneran bidim fêmkirin ku dikarin helbestên mehwî bi corekê li hev bidin ne tenê bi cîhana felsefê û tesawifê ve bidin girêdan.

**ÖZET**

Bu bölümde felsefe ve din'in tanım ve sözcüklerinden (kelime) bahsedilmiştir. Daha sonra dini felsefeden bahsetmişim ve dini felsefeden bir kaç örnek göstermeye gayret etmişim, özellikle Mehwi'nin eserlerinden örnek vermek istedim, daha sonra yine genel olarak şiir dilli ve Mehwi'nin şiir dillinden bahsetmişim. İkinci bölüm: bu bölümde de mehwinin şiirlerinin yoluyla genel bir toparlama ve değerlendirme yapılmıştır, ayrıca din ve dini felsefeden de bahsetmişim. Ayrıca nasıl kavrayıp anladığıma göre bahsetmeye ve anlatmaya gayret etmişim. Gerekli özel ve doğru bir belge ile mehwinin şiirlerinin üzerine kendi fikirlerimi beyan etmişim. Üçüncü bölüm: üçüncü bölüm mehwinin divanından bir kaç satır şiir ve şiirlerinin anlamlarından oluşuyor, ve aşıkların başindan geçen aşk hikayelerinden oluşturuyor. Âşık mehwi dir meşk de şiirlerin ona yazıldığı kişidir, buda düş te geçen bir olaydır, bunu da burda okurlarıma anlatmak istediğim mehwinin şiirleri sadece felsefe ve din ile bağlantılı değildir ve başka bir şekilde aşk tarafını da anlatmak istemişim.

# ABSTRACT

I have introduced Philosophy and Sufism in terms of definitions and word formations. Then Sufism (mysticism) has been discussed by giving examples about this ideology. Therefore, some poems have been shown which we can apply the philosophical Sufism on them. Especially, the poems which were written by Mahwi. On the other hand, I have talked about the language of poetry in general and Mahwi's language. Second Section in this part Sufism and philosophical Sufism are introduced and organized through Mahwi's poems. I have tried to analyze my thoughts and opinions in a way that will be applied in Mahwi's poems. Third Section  Some excerpts of Mahwi poem have been chosen in order to be precise. Also some sonnets and their meanings are shown which a romantic fantasizing story created between a lover and his beloved. The lover (Mahwi) and his beloved is the person to whom he wrote these poems. Furthermore, through this way we can a find link between his Sufism and his romantic relationship.

## PÊŞGOTIN

Min ev teze kirîye Sê beş.Beşê Yekem: Qala felsefe û tesawif di alîyê pênase û peyvande hatîye kirin. Lê belê her dinav vê de qala armanc û encama felsefê û tesawifê jî hatîye kirin.Min ji ber xwe armanc û encam nedaye nasnadin. Min binçîne û pênaseya peyvan li gel armanc û encama wan qalkirîye. Piştre min qala felsefeya Tesawifî (Oldarî) kirîye û hewilmdaye mînakan ji bîr û bawerîya felsefeya tesawifan bînîm, bi taybetî ewên li cem Mehwîne. Piştre jî min qala zimanê helbestan bi giştî û zimanê helbestên Mehwî jî kirîye.Di wir de min taybetmendîya zimanê helbestên Mehwî jî dîyar kirîye. Piştî wê jî min hinek di derbarê jîyana Mehwîjî de nivisîye her çiqas ne gelek jî be lê belê qasî pêwîst min di tezê de nivîsîye. Beşa Duyem: Di vî beşî de jî kokirinek di rîya helbestên mehwî de jî hatîye kirin. Qala Tesawif û felsefeya Tesawifê jî kirîye. Zêdetir min hewildaye ez bixwe çawe jê fêmdikim û qal bikim û Şîrove bikim. Encamek bi belgeyên pêwîst rast yê fikrê xwe her dinava helbestên mehwî de bidim dîyar kirin. Herî zêde min di vî beşîde pişt bi fikrên xwe daye girêdan. Ji ber ku ewa hatîye gotin nivîsîye û dubare hatîye komkirin û nivîsîye, di be ne karekî pêwîst be. Bel ku ewa di mejîdeye hîna ne hatîye li ser rupelê, a girîng ewe ku bê nivîsandin ji bo dahatuyê. Beşa Sêyem: Beşê sêyem jîji dîwana Mehwî çend rêzikên helbestê û wateya helbestan, berhevkirina çîrokên dildarî yên dinavbera aşiq û meşiqande hatîye çêkirin. Aşiq mehwîye û maşiq jî ew kesa ku jêre hatîye nivîsandine. Ev jî wekî dahênanekî di mejîde hatîye. Min xwest divê rêyê de ez bi xwêneran bidim fêmkirin ku dikarin helbestên mehwî bi corekê li hev bidin ne tenê bi cîhana felsefê û tesawifê ve bidin girêdan. Ev li alîyekê li alîyê din jî min hest kir ku ev rê wisan bike xwêner ji cîhana derveyî helbestên Mehwî fêm bikin. Bikarin bi evînîya mecazî ve jî girê bidin. Ev her çiqas peywendîya wê bi Teza min re jî nebe lê belê min li ser nivîsîye. ji ber ku xwêner an jî rexnegir û lêkolînva hest nekirn ku min tenê alîyê pişta peyvên helbestê girtîye dest belku ez serkêşê alîyê ji derveyî helbestanim. Di dawîya beşê sêyem de jî min encama babeta xwe bi çend hevokan daye destnîşan kirin.

## KURTEBÊJE

| | |
|---|---|
| amd | : Amadekar |
| B | : Berg |
| Ç | : Çap |
| H.r | : Heman rûpel |
| J | : Jimar |
| C | : Cild |
| Ko | : Kovar |
| R | : Rûper |
| T | : Tercume |
| Wer | : Werger |
| Weş | : Weşanxane |
| d.m. | : dîwanî mehwî |
| d.h. | :dîwanî hafizê Şirazî |

## DESTPÊK

Bê guman Felsefe û Oldarî (Tesawif) du cîhanên taybetin, her du jî nêzîkî mirovane. Hemu mirov li ser van her du cîhanan di hizirin. Dema ku mirov derîyek ji her du cîhana vekir ket dinav de êdî nikare derî bigire. Gelek derîyên cîhana felsefê û oldarîyê heye, tu her derîyekê bigirî wê derîyek din beraberî te were ew jî vekîrîye. Bê guman xilasî ji her du cîhana tuneye. Min gelek nivîs di derbarê van her du cîhanan de xwendîye û demek zêdeye li ser xebatan diki. Dema ku min di ew nivîs di xwendin min hîs dikir ku gelek kurahî di her du cîhana de heye. Wextê ku min nivîsên Mehwî jî xwend min fikir kir ku rojek li ser Mehwî ji binivîsim. Cîhana ku Mehwî tê debû min ji xwe bi wê cîhanê ve da girêdan. Sedemê hilbijartina navnîşana babeta min jî yek jê ev bû. Her çîqas min tam berfireh jî xebat li ser nekiribe jî sedemê wê jî yek nebûna derfetan, çavkanî û pirtûkên ku li ser Mehwî hatîn nivîsandin piranî li ser oldarîya Mehwîne ne li ser Felsefa oldarîya wî ne. Hemu yan li ser Sofîtîya Mehwî nivîsandîye ne li ser Felsefe û Felsefa Tesawifin. Lê belê min hewildanekî pir daye ku ez babetekî binirx li ser felsefa Tesawif û alîyê Felsefîk di helbestên Mehwî de pêşkêşî we bikim. Xemilandina Felsefa oldarî di helbestên Mehwî de cihê şîroveyê ye. Di helbestên wî de qala kesayetî û cîhan bînînê dike ev jî hêmayên Sofîgerî û Felsefîkîne. Hezretê Mehwî, kesekî dîyar yê helbestvanên sofîgerîyê ye, berbi sofîgerîya felsefîk çûye. Qala bandorîya hunerî dike, Mehwî giringîyekî zêde dide huner û felsefa îslamî. Çanda îslamê, awayê hevokî û rastî hemûyê bandorek zêde li ser Mehwî çêkiribu. Evê Tezê divê derbarê de kar kirîye. Mînakên helbestvanê kilasîk ê kurd hezretê (Mehwî), dîyarkirina alîyên veşartî yên wateya tiştane. Lê belê bingeha Tezê li ser Helbestvanê mezin ê kurd Mehwî ye. Dîsan eşkerekirina helbestên veşartî, derxistina Metelokan û dîyarkirina helbestvanên pêş serdema xwe. Şîrovekirinê zêde di bexşîne ji bo fêmkirina cîhana İrfan û cîhana sofîgerîya hezretî Mehwî û bawerîya wî.

## 1. Felsefe û Tesawif Oldarî di alîyê Hişmendî, Peyv, Pênase, Armanc û Encamê de

### 1.1. Hişmendîya Felsefê

Peyva "Felsefe" ji Girekîyan hatîye. Felsefe ji Yunanîyan hatîye destpêkirin. Ewan jî ji çavkanîyên pêşîya xwe yên wekî Misira kevin, Sumer, Babîl, Aşurî, Çînî û Hindîyan wekî sudekî mantiqî û fikrî girtîye. Destpêkê sud ji van gelan girtîye bi jîrîya xwe û hişmendîya xwe sud ji fikrê şaristanyeta van gelan jî girtîye û piştre bi hişmendîya xwe gihiştine encamekê ku felsefe derxistîne holê. Di dîrokê de jî dîyar dibe Yunanî ji hemû gelên di serdema xwede afrênertire. Bi taybetîjî avakirina cîhana felsefê ye. Cihê destê wan di avakirina felsefeyê de dîyare.

Felsefe di alîyê çêbûna xwe de ji du peyvan pêktê, ev her du peyv jî Girekîne. (Fîlo) tê wateya (Heskirin), (Sofya)' jî tê wateya (Zanîst). Her du peyv bi hevre tê wateya Heskirna Zanîstê yan jî jêre dibêjin Fîlozof jî (Philosophy). Li gorî çavkanîyên Yunanîya peyva felsefê yekem car ji alîyê (Pisagor) ve di sala (570- 495 PZ) hatîye karanîn. (Zanîn û jîrî tenê beşê xwudawen de ez bi xwe tenê ji zanîstê hesdikim û Fîlozofim)[1].

Her jivê gotina Pîsagor em hest dikîn ku felsefe çiqas dibin bandora Ayînê de maye. Pîsagor ji ber îdeolojîya radîkal a wî demî ne gotîye ez (Sophos) Zanistvanim. Ji ber ku gelê wî demî Zanist tenê para xudawende dizanîn û kesê ku bi gota ez zanîstvanim ew wekî yekî îxanetkar didîtîn. felsefa jî li ser bingeha pirs û bersivan hatîye sazkirin.

Li gorî Dîkart Felsefe pêktê ji (Lêkolîna Zanîna (Hukmet) zanina Zanistî, ew zanîne ku sîstemekî giştîye ji bo berjewendîyê mirovan heye)[2]. Di vir de Dîkart dide dîyarkirin ku Felsefe ne tenê komek zanîne, beşekî ne taybete. Belku li gorî wî felsefe bingeha zanîstê yan jî koka zanîstê pêktê û dibe giringtirîn beşê zanîstê. Felsefa Dîkart ji zanîsta derbarê xweda, xweza û mirov pektê. Lê belê tişta ku ji felsefa Dîkart hatî fêmkirin eve hemu heyîn jê fêmdike û Xweda çavkanîya hemu hebuna ziman û rastîyane.

### 1.1.1 Armanca Felsefê

Bê goman xwesteka her zanîstekê armancekê jî bi xwe re dertixe.

---

[1]. Hemîd Ezîz, *Bineratîyekanî Felsefe*, Çapxane Serdem, Silêmanî,2015. r 14

[2].Şaho Osman Nêwendî*, Binemakanî felsefe, Dîkart*, Roşengerî bû lêkolîneweî fikrî û Sîyasî, Berga yekem Hewlêr 2015 ,R45.

Hemu zanîst armanc û xwestekek taybet a xwe heye. Çend pirsên Ayîdolojî çêdike û çend caran jî pirsgirêkan di hizrê mirovan de dide avakirin. Berdewam jî hewil dide li pey çareserkirina wan pirsgirêkan bi gere û bersiva wan pirsan jî bibîne. Carna mirov temaşeyî asîman dike û pirsyarên bi goman di mejîyê mirov de çê dibe. Mînak pirsa di derbarê gerdunê de,mirov carna dibê je erê gerdun çîye? Mirov çîye? yan jî ew hemû tişt çîne û çawe çêbune.

Di vir de Felsefe jÎ wekî hemu zanîstên din xwedî erk û armancekê ye. Felsefe jî lêkolînê li ser van corên hizir û pirsan dike. Her çiqas wekî zanîstên din bersivek misoger ji wan pirsan re nebîne jî lê bi awayekî vekirî şîrove li ser dike. Fîlozofek bi dîrokê lêkolînê li ser babetekê bike derencamekê ispat bike û bi gihe encamekê belku di paşerojê de fîlozofek din were bi corek din heman rêbaz û fikirêwî ret bike. Ispatkirinek din ji bo babetê bibîne. Ji ber vê jî hemu fîlozof ne heman fikrin, zanîst û felsefe jî gohertinû retkirin di paşerojê wan der derdikeve holê.Her we ku Arîsto jî ızpat dike dibêje: Pêwîste felsefe hebe, ji ber ku pêwîstîya me bi felsefê heye. Ev fikre ji bo me vê radigihîne.Armanca Felsefê ji raman çêbuna buyeran lêhurbûna babetên hizrî pêktê. Hemu zanîst bi giştî peywendî bi felsefê re heye. Felsefe û zanîstên din jî bandorî û karkirina wan li ser hev heye. Girtina dest a hemu alîyên jîyana mirovan armanc û lêhurbûna gerdunê û hemu babetên bîrmendan cihê hizirîn û dîtinê ne. Pirsgirêk û pirsyaran bi rêya îradeya aqil izpat dike. Hebun û nebûna tiştan jî bi rêya îradeya aqil derdixe holê. Şîrovekirin û çêbuna gomanan jî ji azadbûna aqil pêktê. Bi van jî çalekî, xwestek û tevgera xwe pê dike, ji bo fêmkirina tiştan yan babetekê pê vedikin. Herî zêde hewil didîn alîyê ji derve yan jî alîyê navîna tiştan bi xelkê asayî bidîn fêmkirin. Ev hemû jî peywendî bi ruyê ji derve û rihî ve heye. Giştî ev xalane hemû xalên girîng ên armanca felsefê ne.

### 1.1.2 Taybetmendî û Bingeha Felsefê

Çawe be jî hiç nasandinek bê taybetmendî û bê bingeh nabe. Demekê de dikarin danasînekê ji bo bingeha tiştan bikin. Hemu tişt jî piştbi bingehan ve girê didin. Ev hemu ne bi şêweyekî zincîrîne yan jî bi şêweyekî zincîrî dernakevin holê. Eger bi şêweyekî temam dernekeve holê tê fêmkirin ku rêbaza felsefê derketîye holê. (Tiştek ji tişta din derbikeve belavbuna wê jî eşkereye di wateya xwede jî cudaye).

Di vir de taybetmendîyên Felsefe bandorîyekê li ser tiştandike ev bandorî û lêhurbûn wisan dike ku tiştek ji tiştandin bandorbibe û li ser bi hizire ku bi dest bixe. Bêgoman ev jî dide îzpat kirin ku tiştek ji tiştekî din derbikeve yan ji desteser dike. Taybetmendîya herî dîyar a felsefê lêhurbûna têr ramane û hizirîne. Yek ji taybetmendîyên Felsefê ji pirsyarkirinê pêktê. Her wek ku me di nivîsa xwe a pêşdejî qal kirî bû, hizirîna zêde a tiştan wisan dike ku goman û pirsyar derkeve holê. Eger li ser tiştekî bi sekinî û li ser bi hizirî bê goman wê pirsyar jî di mejî de çêbibe. Peywendîyek gelek dinava van her du tiştan de heye ev jî wisan dike ku tiştek ji tiştekê dest bikeve. Eger tişt nebin tu jî nikarî li ser bi hizirî û pirsyara çêbikî, ev jî yek ji taybetmendîyên herî girîng a felsefê ye. Tybetmendîyên Felsefê ên giring evin destpêkê raman, hizirîn û pirsyarkirin ev hemu jî tiştan li pey xwe de tînîn, wekî rexnegirtin, îzpatkirin û retkirin.

Rêxistinek a felsefê di dawîya sedsala 19' an de bi serkêşê fîlozofê Emrîkî Çarliz Sendrs Pîsers (1839-1914) serî hilda. Piştre jî ji alîyê Wîlyam Cîmiz (1883-1931) û Corc Hêrbêtmîd (1863-1931) giringî hatîye dayîn. Evan bîrmendan li ser retkirina rêbaza sunîyan di alîyê xwezaya rastî û wêneyên rastî hevdeng bûn. Li gorî wan (Em nikarin li rêya rêbaza zanîsta pozîtîfîzm cîhane xwe bê pêwîstî bihêlin. Ne karekî pesend kirîye. Di destpêkê de lêkolîna piragmatîkan pir bi wateye, ne bi karanîna rêbazekê yan çend rêbazekê ye. Belku bi xistina tîrêjan a li ser ezmuna asayîye, ji cîhanek baş hesdikin û destpêdike)[3].

Bi wan rêbazan bingehek ji bo felsefê hatîye danîn. Her wiha di pirtûka (Ostaşdîsant Pol) Bi navnîşana Quadripartita. Derebus, Dialectics, Moralibus, Physics (Summa Philosophia ae, Metaphysicis).

Li gorî vê rêxstinê tê dîtin ku ewa di beşê yekem de Mantiqe, di beşê duwem de jî reftare, di beşê sêyem de jî fîzîke û di beşê çaremde jî dawîya Metafîzîke. Bi heman şêwe Fîlozfên îslamî jî wiha rêkxistine mînakên berçav bidin naskirin rêbaza Metafîzîk dikeve dawîya beşê çarem. Lê belê fîlozofê Firansî û damezrênerê felsefa nujen Dikart bi temamî dijberî wan dike. Metafîzîk dike destpêk, ev jî wekî şoreşek bû di cîhana felsefeyê de. Felsefe wekî xwe nemaye ku bibe destnîşanek ji bo cîhana tişt dîtinê û cîhana tiştne dîtinê. Di cîhana xwe de metefîzîk wekî pileyekî bilind dibîne, li ser wê re tenê zanîst pileyek bilind heye. Belku metafîzîk rêya bingehîn a şîroveyê ji bo dide avakirin. Dr îbrahîm Mihemed di pirtûka xwe a binavê (ma alfalsafa?) de, çend taybetmendîyek ji bo felsefê danîye. (Paqijkirn, raman, Lêborîn, Rexne belge)[4].

---

[3].Ehmed Mihemed Por,*Felsefe mîtodî le zanîste Miroyîyekanda*, , Seîd Kakeî, Çapxaneî Mûkiryan, Hewlêr, 2013,78.

[4].İbrahîm Mihemed Tirkî, *Ma alflsfe*, Dar alwfa ldîn algbae walîşr, Alaskndrîe, Cmhurye Almsr erebye, 2007,r98

Ev hemu çend mînakên taybetmendî û bingeha felsefê ne. Lê gelek mînakên din jî hene ku qala wan jî bê kirin. Gelek fîlozof hene divê fersendê de hespên xwe bezandîne. Lê belê çend mînak hene ku me pêwîst dîtîye em bidin destnîşan kirin.

### 1.1.3Pênaseya Felsefê

Felsefe têr raman û lêhurbune di hizir û fikran de. Eger bi şêweyekî sade be û li ser asta zanistî be bibe babeta hizirînê. Bi corekê bibe sedemê xemilandina jîyana bîrmendan. Li vir û li wir jî nasandinên cuda cuda ji bo felsefê hatîye kirin. Her kesekê bi hizr û fikrên xwe pênaseyek ji bo felsefê kirîye. Wekî Sokrates, ji bo nasandina Felsefê dibêje: (Bilindtirîn Zaniste). Di vir de Sokrat bi xwe felsefe wekî babê zanistên din daye nasandin. Bi şêweyekî giştî heya niha nasandinek taybet ya felsefê tuneye bibe nasandink ji bo hişmendîya felsefê. Ji ber vê jî dinava her miletekê de yan jî dinava her fîlozofekê de hizir û fikrên cuda cuda ji bo nasandina felsefê heye. Belku tê dîyarkirin ku fikrê niha û yê pêşîya xwe nabe yek, belku ew fikrê pêşîya xwe jî jêbibe. Nasandina hişmendîya felsefê ji alîyê her zanayî û fîlozofî ve cudaye. Bê goman her fîlozofek nasandine li gorî fikrê xwe ji bo felsefê kirîye ji ber vê jî hemu nasandin ne wek hevin û cudane ji hevdu.Her weku Eflaton di komara xwe de jî daye nişankirin û dibêje: (Fîlozof keseke dikara li pey bingehek ne gor de biçe. Di demekê de mirovên asayî  ji vê bê barin, di cîhana zêdebun û goherînê de serkêşin)[5]. Di vir de Eflaton fîlozofan ji mirovên din cuda dike. Ew fîlozofan digihîne asta herî jor pesend dike ku ew dikarin goherînekî mezin bikin. Li gorî fikrê Eflaton hebuna bilez û hebuna bi qalib cuda ye. Ew hebunên me wekî hebunek bileze tê dîtin em dikarin bazarê  li gel bikîn, lê ew vê tiştê ret dike. Her divê derbarê de li gorî Teorîya Dîkart: (Felsefe li gel van fîlozofan pêkhênere). Ev hişmendîya felsefê tê wateya lipey zanînê de geran, tê bi wateya hûrbûna zanînê di ramanên tiştên kurt de. Belku vê radigihîne zanîna hemu tiştan ewe ku mirov dikare hemuyê nasbike, da ku ji bo pêşxistina jîyana xwe ji bo tendirustîya xwe û hunerê bi afrînin. Ji ber ku bixwe destnîşan dike pêwiste mirovên ku beşê herî serekene giringîyê bidin felsefê. Ji ber ku felsefexwarina herî bi tendrust ya aqile. Ew ji bawerî bi programa aqile ku bi xwe jî hebu. Aqil xistîye pêşîya hemu tiştî. Her weku di pirtûka (Binemakanî Rêmayî Eqil) de bibêje: (Zanîn bi çi tiştî zanîne, li ser wê tiştê dibêje ku ew raste belgejî jê re naxwaze ka ew tişte ewe yan na. Ev jî bi vê wateyê tê ku hemu tişan ji bi lezbûnê dur bixe.

---

[5].Soran Ehmedheme , *Komarî Eflaton,* Le Îngilîzîwe, ,Rêbiwar Qaramanî,Mehdî Hesen Çoman, Çapxaneî Wezaretî Perwerde, Hewlêr, r, 295,2006.

Xwe bi biryarên pêşî ya xwe ve girê nedin, di biryarê min de zanîn nadanim da ku aqil min şaşneke di eşkerekirinê û cuda kirinê de. Ya herî giring jî nehiştina gomanane)[6].(İbn Roşdî) Fîlozofê binav û dengê Endonozî dest û bejna wî heye divê meydanê de. Hespê xwe bezandîye. Ev zanyare di pirsgirêka (Aqil û Ne aqil) de, benikê mîzanê di alî yê yê yekem ve vedike aqil lêkolîn kirîye û xistîyê rêza pêşîde û dibêje: (Eger mijarek li gel aqilne guncê, aqil ne gire û naveroka wê li gel aqilê zîrek piştrast nekî,wê mijarê pişt gohde bavê je û tenê dilsozê firmana aqil be)[7]. Bê goman her fikrek kêm û zêde xeletî tê de heye. Ne şerte ku fikir û hizirîna du kesan yan babetek, projeyek û nasandina tiştekî wek yekbin. Di vir de fîlozofê binav û dengê Endinosî (İbn Roşdî) tenê aqil kirîye bingeha felsefê. Xwe ji hest û dilsozîyê dur xistîye buye xwedîyê pêşerojê li ser dîtin û ramanê xwe diçe. Tiştan bi wê rêbaza ku ew jê bawer dike û qet gomanek tê de nake şirove dike û îzpat dike. Bi fikrê min eger bi çavekî rastî temaşe bikîn gerdun (fîzîk) û ewa ji derveyî xwezayê (Metafîzîk) ez dibêjim her du wekî hiş û hest du cîhanin. Em dikarîn bi hevre ji xweşiktirîn cewherê felsefê fembikin. Bi cîhanekî zîrek bi rêya aqilyet û ne aqilyet bi gihên cewherê tiştan. Goman di vî fikrîde nîne ku kêm û zêde rastî tê deye. Armanca min di vir de we ez nasandinekê ji felsefê re bikim, ne şerte ku hemu kesek qebul bike. Lê belê li cem hinek zanayan rengîne.Bi be cihê balkêşîyê zêdetir giringîyê bidinê û zêdetir kar liser bikin. Gelek zana û fîlozof li ser rêbazên cuda cuda dibêjin: Felsefe reda hestan daye tenê bi aqilê felsefê xwestîyê aqilê jîr di karên cîhanî de izpat bike. Ew ji bi wan belgeyên hizrên felsefîk encama aqilê zîrek pişt rast dike. Li gorî fikrê min felsefe tenê bi biryarên aqil di hemu meseleyan de nagihe encamekê. Ji bo wê jî min di pênaseya xwe de gotîye: (Lêkolînekî Hizrî û hestîye). Xwesteka min di vir de ewe ku hinek caran hest jî cihê aqil digire. (Hest), biryarek ya her mirovekê ye ku tê de beşdar bibê. Lê belê ez dibêjim felsefe zêdetir dilsozê aqile. Ji ber wê jî min (Hiş) pêşîya (Hest) xistîye. Tê xuyakirin ku ev jî li gel fikrê Dîkart di guncê. Ji ber ku li gorî wî jî di felsefê de aqil desthilat dare.Lê belê heya demekê belgeyên pêwîst û pozîtîfî bun. Her çiqas belgeyên jê re pêwîst di destda bû ê (Hest) binegatîfî tê meydana babetê. Pêwîste ne aqilî be. (İbn Xaldon)' ew ji di babeta zanînê de bawerîya wî ewe çavkanîya tê derxistin sedemê hestyarîyê ye û dibêje: (Hemu aqil û bê aqil hevbeşin di derxistina hestan de. Lê belê mirov bi derxistina giştî hestan de tê cudakirin). Her wiha di derbarê bingeha destpêka îspat kirina aqil de dibêje: (Fikarên hizirînê divê ben girtina dest û fikarên hizirina pêşxwe jî ne şerte bê girtina dest.

---

[6]. Meskîf Xalîb,*Dîkart talîf*,Fîsbîl Musue Flsfe, Mnşurat Daru mktbî alhîlal, Byrut Lûbnan,r74, 1982.

[7]. Hemî Ezîz, *Bineratekanî Felsefe*, , r, 10

Ji ber ku kesekê nasînekî temam nîne derbarê bingeha deronîyê û qonaxên wê. Belku ji çend tiştên deronî diavêje. Mirov bê desthilate di zanîna bingeha zanayan herî zêde di pirsgirêkên berçav de vedikole). (İbn Xaldon) Zanînê wekî yek ji hêza aqil dibîne. Ji derxistina naveroka tiştan re jî dibêje: bawer nekin li hevketina hizran di hêza herî bilind a heyîna deye. Xaldon di derbarê van de dibêje: Di demekê de ditirsim aqil bê tewanbar kirin. Ji ber ku aqil hêza herdemî ye. Her wekî (Gomankar) û (Sofîstjî) dibêjin, ji ber wêjî ew ji bi lez dibêje: (Ev jî ji aqilê derxistî kêm nake, belku aqil pîvanek raste biryarek raste û bê gomane)[8]. Ez naxwazim ji vî beşî derkevim, ez di xwazim di vî beşîde qalê bikim. Ji ber ku babeta aqil bi xwe pêwîste lêkolîn li ser bê kirin. Di virde ez di xwazim çend pênaseyên kurt li ser feşsefê bikim

(August Kant) yek ji damezrênerê Sosyolojî yê ye. Li cem gelik zanaya August kant di wê bawerîyê deye (Felsefe... Rêbazek giştîye di derbarê zanyarîyan de). (Flîspn Şalye)' ê Firansî dibêje: Felsefe... Zanyarîyeke yan lêkolîneke di jîyana deronî de û peywendî bi jîyana giştî cîhanê ve heye). Di gotarek a pirtûka (tarîx felsafa al arabîye)[9] de hatîye (Felsefe... Destpêkê de hewldaneke ji bo zanîn û nasandina hemu heyînan di cîhanê de. Gotar û kiryareke rêk ketîye di gel zanyarîyan de).

Piştî wîya jî xwedîyê pirtûkê bi xwe jî dibêje: (Wisan bû, felsefê serî derxistîye ji wan zanyarîyan û bi wan zanyarîyan em jî serî derdixin ji hestan ta weku em di encamê de bi rêya wan zanyarîyan berbi armancê ve biçîn).

## 1.2 Tesawif (Oldarî)

Zanayên kevin û yên nu yên rojhilat û rojava fikrê wan ê di derbarê Tesawifê de cîyawaz bun. Her wiha fikrên wan cîyawaz bûn di derbarê destpêka derketina pêşengên rêbaza terîqat û tesawifê de. Di destpêka tesawifê de sedemek wekî (Wesîle) derketibu ji bo nasandina Xweda û Xweda perestîya rast. Bi fikrê van kesan xebat kirîne. Ji bilî nunerên Ayînî zêdetir xelk wekî nunerê baş derdiketin. Lêbelê hêdî hêdî bi pêşveçûn û ber firehbûna rêbazê re, Zêdebûna Şopîneran re, armanc û encamên wan jî ew bu ji her zanistekê zanistek din derbixîne. Bivî awayî bi sedan pirtûk dan nivîsandin. Ev pirtûkên hatî nivîsandin jî ji alîyên wan kesan ve bû ku li ser rêbazê bûn.

8. *Ibn Xaldun ,Muqeddîmat Ibn Xaldun*, Tbeh lcnha albyan Al erbî, Qahêra,1975. R515.
9. Emîn Şêx Eladîn Nexşîbendî, *Tesawif Çîye*?, Çapxaneî Jîn, Silêmanî, 2002, r, 42.

Tesawif her di destpêkê de destpêkir, bi bîranîna xwedayê mezin re jî gav bi gav ber bi pêşveçûnê çû. Peywendîya di nav bera mirov û yezedan de pêwîste, ev jî heya demekê yan jî heya dawî têkilî çêdikin. Ew qas bandorîya wê heye li ser mirovan ta di gihêje heqîqetê. Heger mebesta sofîgertî yê bigihêje rastiyê wê dı jiyanekî raste rast de bi jîn. Di vir de hem alîgirên wê zêde dibe û hem jî dijminên wê zêde dibe. Hinek liser vê rêbazê diçin û hinek jî xwe liser çîrokên xorafî cewherê mîtolojî yê de datînin. Jıber kû di tesewifê de carnan qala hinek tiştan tê kirin kû tu peywendî ya wê ligel mirovan nîne. Liser vê rastiyê mirov di fikrek aqilmedî de di jîn.

Eger mirov ji xwîn û masorke yan pêk hatî be, çawe wê aqil li dijî kesayeta xwe bi gire? (kit û cot)? mirov xwediyê du çavên bi hêze. Lê belê nikare temaşeyî tiştên pîs neke. Wê çawe mirov bikare bi çavê kû li xwe di nêre li kesê beramberî xwe jî bi nêre?Feza ya tesewufê gelek berfirehe. Çiqasî dilsozên wê zêdetir be, ewqas ew jî berfirehtir dibe. Jiber kû her sofiyekê i corekê qala tesewufê kiriye. Qet kesek nikare bi temamî qala tesewufê bıke û zelal bike ka çiye û çaweye. Eger bi çavê zanîstekê lê bê temaşe kirin, em dikarin bêjin zanîsteke ziman û peyv liber çûye ber çûkan. Jiber kû tesewuf xebateke, heya kû tû wê xebatê nekî, tû nizanî çiye û çawene. Heya kû tû nexwî, tu nizanî çi tame.

### 1.2.1 Pênaseya Tesawifê (Oldarî)

Eger em bi xwazin peyva tesawıf ji kur hatiye? Armanc û wateya wê çiye? Çawe çê bûye? Çafkaniya peyva tesawıf çiye? Gelek fikrên cuda hene. Me ev zanî kû tesawif rêbaz û xebateke. Fikrek di bêje: bingeha peyvê ji (Sof) ji wate ya (Roj) hatiye. Ev jî tê wê wateyê kû Rojpoş bûye. Fikrek din yê lêkolînvanên rojhelat nasan jî di bêje ji peyva (Sefa) yan Ezhabî hatiye. Li gorî hinek din jî ji peyva (Sofiya) Yunanî hatiye. Ev jî tê wate ya Zana-Hişmendî. Lê belê piştê lêkolînekî zêde li gorî gelekan jî peyva (Sofî) ji Erebî hatiye. Ev jî tê wateya (Roj). Ji ber kû di bêjın di alîyê rêzimanî de ne ji peyva Erebî ya (Sefa) hatiye kû tê wateya (Roj). Ji ber kû di bêjin di aliyê rêzimanî de ne peyva (Sefa), ne peyva (Sefefa) û ne jî peyva (Sofiya) bi çi corekê nabe rastîya peyva (Sofi).Zêdetir (Ebu Rîhanî Bîronî) (973-1048) Z, bawerîya wî ew bu ku ji peyva (Sofya) Yunanî hatîye. Piştî sedsalekê ew peyv hat gohertin ket ser zimanê erebî bu (Sofî). Lê belê gelik çavkanî hene yên wekî (al mah) (Ebu Nesed Srac) (378) koçî xwestîye ku bi gihê je wê bawerîyê (Dr Zekî Mubarek) di çerxa niha de dijî dibêje:

Hemu li ser wê bawerîyêne ku çavkanîya vî navî ji cil û bergên sofîyan ê wekî rojê tê. di pesindayîna Pêximber de dibêje: (Ewqas bi ji xwe hesdikir cil û bergên rojî li ber xwe dikir. Siwarê kerekê dibû. Herwiha (Hesen Albsrî) dibêje: Çavê min li 70 kesên ku beşdarî şerê Bedrîye ketîye, hemuyan cil û bergên rojî li ber xwe dikirin.Ji bilî vê jî çavkanîyên wan eşkere dike ku (Eshabî Seffî), kesên zêde yezdan perest hemuyan jî cil û bergên rojî li xwe dikirin. Di vir de jî eşkere dibe peyva (Sof) tê wateya (Roj). Ji navê Sofî zêdetir gelek navêdin jî ê wekî sofî hene. Mînak: (Zuhed – Fuqera – al şkeftîye – al jueye)[10]. Di hemu sofîyan de ev berjeng hebû. Pişt didan cîhanê, ji ber vê jî jêre di gotin: (Zahîd). Ji ber vê jî xwe wekî pêdîvîya xwedê didîtin. Ji wan re jî digotin: (Feqîr) Her roj, her heyîv û her salekê li cihekê bûn ji ber wê jî jêre di gotin: (Xoreba). Li gelek cihên wekî şikeft û di şikeftan de bi yezdan perestîyê ve xerîk dibûn. Ew qasa ku ne hatî xwarin jî jê re di gotin: (al jueye). Lê belê ji ber ku her carê cil û bergên rojî li ber xwe dikirin ji wan re digotin (Sofî), ev nav jî bi wan ve hat girêdan. (Mihemed Reof Teweklî) di pirtûka (Dîroka Tesawifê Di Kurdistanê De) ji bo wate û bingeha peyva Tesawif di vir de dstpê dike ku sofî (Eslê sofî) be. Mijar dirêj dibe û dibêje: (Bi gotina hinek ew kesên misilman ên di rêza pişt Pêximber de nimêj dikirin ji wan re digotin: (Benî sofî). Lê belê li dawîya mijarê de qet lêkolîn yan çavkanîyek rast a ji bo peyva (Sofî) tuneye. Her wiha ew peyv jî bi bingeha xwede ne erebîye. Ji ber ku heya çerxa koçî jî ev nav ne hatîye windakirin. Yekemîn nivîskarê ku ev peyv bi karanî (Elcahiv) di pirtûka(beyan û tebî) de bi karanîye. Yekem kesê ku ev nav jî bi kar anîye (Ebû qas Kofî)[11]ye. Her çiqas dibêjin peyva sofî di sedsala yekem a koçîde ketîye dinav de. (Hesen Besrî) kesek nunerê mezin ê îslamîya tesawifêye. Di sala (624-728 Pz) de jîyaye, dibêjin di dema tewafê de çavê min bi sofîyekê ket min dest avêt berîka xwe û min xercek dayê lê qebul nekir...... Herweha (Sofya Alporî) ew jî keseke, mezinê şopderarê zanyarîyên (Hedîs û kilama Tesawifê) ye. Di salên (715-778 Pz) de jîyaye. Dibêjin: (Eger Ebu haşim Sofî nebuya qet min ne dizanî rîya wê çîye û çaweye). Ji wan zilamên baş re digotin rêya Zehdîyan girtîne)[12]. Peyva tesawif di kurdî de bi wateya (Sofîgerî) tê. Ji rêbaz û mijarên wê re jî bibêjin (Mîstasîzm). Ji bo em bizanîn tesawif bi çi armancê tê pêwîste em temaşeyî li jêr bikin. Li gorî zanîstên cuda: Di alîyê deronî de, mirov hest bi wê dike ku peywendîya bingehîn belavbûnek heye.

[10].Heman Çavkanîya Pêşî, r 191.
[11].Ebdurehman Bêlaf Berzencî, *Terîqetî Neqşîbendî*, Çapî duwem, Çapxaneî Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2002, r, 791.
[12].Emîn Şêx Eladîn, *Tesawif Çîye*, r, 90.

Di alîyê Felsefê de jî: Heyîneke ji soza xeyal çavkanî girtîye ne ji aqil û hestdaran. Di alîyê Ayînî de jî: Zanîsta dilane, ji rewşa deronî û nav singa mirova pêktê. Her wiha ji paqijkirina dilan pêktê.

Dibe sedemê nêzîkbûna peywendîya bi cîhan û xwezayê re. Lê belê di beramberî wê de mirovan ji reftarê xwezayî dur dixe û ji berjengê mirovatî jî dur dixe. Di îslamyetê de ji vê rewşê re dibêje: (Sofîgerî- Suphisme) Pêwîste em bizanin ev cudaye ji (Sophimes) ku tê wateya (Sofste)[13].

Ez bixwe jî di vir de dixwazim fikrê xwe bêjim li ser bingeha peyva Sofî ji (Sof- Roj) hatîye. Ji ber ku em dibînîn di zimanê Farisî de ji sofîyan re dibêje: (Pêşmîne poş- Pêşmîne Poş)[14]. Tê bi wateya (Roj poş), peyva (Pşm- Peşm) jî tê wateya (rojî). Di gelik helbestên helbestvanên farisî de jî hatîye. Mînak: (Hafizê Şîrazî) divê rêzikê de dibêje:

*Pştîmîne poş tndxwa az eşq nşnîst bûç.*

*Az mstîş rmzî bgo tatrk hşyarî knd. d.h.*[15]

Piştî wê me zanîn ku ji wan kesên bi felsefê re mijol dibin dibêjin: (Fîlozof). Ka em bi zanin ji wan kesên ku bi tesawifê ve mijol dibin dibêjin çi. ( Mihemed Rewif Teweklî), di pirtûka xwe a bi navê (Mêjoyî Tesawif le Kurdisatan) di du beşên pirtûkê de qala vê mijarê bi berfirehî kirîye. Ji wan kesên ku bi Tesawifê ve xerîk dibin dibêjin: (Ehlî Tesawif). (Mihemed Rewif) ehlên Tesawifê dabeşî li ser du beşan kirîye Mahyet û Cewher, Armanc û Reftar. (Sofî) ew kese ku ji bilî xwe gihandina yezdan (al yaqîn u al heq al yaqîn) çi armancek din didilda nîne. (Muteswif): Ew kese ku hewil daye bi gihêje wê pileyê ku sofî tê de bilindin. Mutesawif, ew keseye ku bi rêya tesawifê malê cîhanê bi dest bixe. Her wiha xwe wisan nîşan dide ku sofîyekî dil pak û deronîya wî wekî ya nura yezdane. Lê belê di singê wî de hêmayek li ser mebestek vekirî heye, ew jî bi destxistina hêmaya wesîleya tesawifê ye.

### 1.2.2 Rêyên Cuda Cuda Yên Tesawifê

Ji berî ku em herin dinava mijara xwe de li ser helbestên Mehwî lêkolînan bikîn emê bi pesend bizanîn.

13. Msgîf İbrahîm Alzlî, *Felsefe Alşerîye*, r, 55.
14. Hesen Emîd Thran, *Ferhengî Farisî*, Çapxaneî Sçhr,Tahran1382, r, 928.
15. Msgîf Aşrfî, *Dîwanî Hafz Şîrazî*, Çapî Pêncem Çapxaneî Azadî, Taran1374,r 149.

Kurteyek ji van nivîsînan bixin berçavan ku amajeyê bi alîyê sofîgerîya Mehwîdike. Heya ku em bizanin ka ta çi demî şayenê xwe daye.Herî zêde nizanîn eger bêjin Mehwî siwarê meydana helbestên sofîgerîya kurmancîya jêrîn qet helbestvanekê jî toza li ber lingê wî ne şikandîye. Di pêşveçûna wê de alîyên helbestvanan li piştî xwe çav lê vekirîne buye rêya nîşandanê. Şayenê wêye ku çend nivîs û çend lêkolîn jî li ser bê nivîsandin. Ji ber vê jî em jî bi hêza xwe hewil didîn wan nivîsandinan dîyar bikî.Mamosta Eladîn Secadî di lêkolîna xwe de amaje bi wê dike ku Mehwîdi destpêkê de goşegirîya wê bi dest nekeve. Piştre jî (Ketîye ser wê bawerîyê ku coş û xuroşek nebe na gehêje ruyê ezîzan).

*Serke coşêkî nebê mn zir ke talim bu çîye.*
*Dil ke hoşêkî nebê şîşeî betalm be talm bu çîye.*

Ji ber vê jî pê navê meydana eşqê baran û bê (ixtîyara şerên eşqê helbestvanan dixwe Mehwî jî dike nasnavê helbestan). Secadî di wê bawerîyê de ye ku tenê soza menewîya mehwî kirîye eşq bêyî ku (Dil kirîbe hêlîna xeyalan rumet kirîbe gulan ji bo bi gehije vê armancê).

Mamostayê secadî ji bilî vêdi çend mînakan de amahe ji bo alîyê sofîgerîya helbestên Mehwîdike. Di dawîyê de jî mînakek ji helbesta Zuhdî tîne û dibêje:

*Dunya Tîyatruye meweste tiya brû.*
*Kê mayewe tîya ke nebûbê tîya trû.*

Lê belê, nabe ev ji bîra me biçe ku Secadî wê mifteyê nade destê me em bizanin kîjan helbest sofîgerîye û kîjan jî Zuhade? Ev destnîşan ne kirîye ku helbestên Zuhde destpêka helbestên sofîgerîye.Ji bilî vê jî evê bi me nade fêmkirin ku ka mehwîdi çi pileya sofîgerîyê deye û ser bi kîjan rêbaza sofîgerîyê ye?

Kake Felah di derbarê sofîgerîya Mehwî de dibêje: (Helbestvanê zanayê Mutesewîf bû). Pêwîsye li cihê (Mutesif) bi gotîya (sofî). Ji ber ku mutesif wê radigihîne ku Mehwî ne sofîye xwe anîye ser şêweyê sofîtîyê.

Nivîskar di alîyê sofîgerîya Mehwî de tenê çend mînakên helbestan nîşa me dike, ku ev jî pêktê ji nirxê jîyana cîhanê û dijminahîya nefsê. Bêyî ku pileya sofîgerîya helbestvanê me dîyar bike, ji me re rabigihîne ku xuşava çi deryayê ye sofîgerî nuş kirîye û berbi kîjan pêngavêdiçe?

Di derbarê eşqa mehwîde nivîskar çend rêzikên ciwan bi mînakan anîye û eşqa mehwî jî tê de eşkere kirîye. (Bêyî ku padaşta heskirina xwe bike Ji vê zêdetir tê de hewar û gazinda germ di destê wî deye û heskirina xwe bi serê hezaran eşqan daye. Ev di şerefa wê kuştinê de be beş û recer dike). Her wekî dibêje:

*Le awî têxî herzamê bu awa.*
*birînî mn nebê herwaye weyran.*

Di akîyek din de ji mere dide eşkere kirin ku Mehwî ji cîhanê bêzar bûye. Lêbelê bêzarîyekî demî bûye her weku dibêje:

*Pîrî nemamî baxî ciwanîm kirde poş.*
*Tazem drextî kulî emel derdekat çrû.*

Ebdula Agrîn di komek destnivîs û çend lêkolînekê de li ser Mehwî belav kirîye, bi dirêjî qala alîyên helbestên wî kirîye. Lê belê ya ku ji alÎyê me ve girîng be em bikarin li ser bisekinin alîyê sofîgerîya wîye ku nivîskar di wê bawerîyê deye. (Mehwî wekî sofîyekê qonax û pileya tesawifê birîye. Her di (Fena û fî alşîx) û piştre (Fena fî Allah ) piştre jî bi qonaxa hêza xwe karîye divê felsefê de).

Ya rastî ewe ku dîyarkirina qonaxa wî a sofîgerîya Mehwîye. Wê demê li gel wê sudmen dibû. Eger di her qonaxekê de çend mînakan ji helbestên wî bi anîyan wê biba belgeyek misoger ji bo wî.

Vê cara nivîskar me berbi cenga Rusya û Japonya 1905 z ve dibe têxe di nava çarçuveyekî sofîgerî corê perçu nîşan dide. Ji me re radigîhîne ku di hemu deman de ne bi bandore,her ya ku heyî jÎ hemu bi hêza xwe (Msbb) buye pêwîste pişt bi vê ve jî girê bide.Divê derbarê de Mehwîdibêje

*Her çî heye musebîye, baqêke fanîye.*
*Bendeî yekê be, bes bibere ebdî sed hezar.*

Di vir de corek hêza Mehwîdinava hêza wî de derdikeve holê. Bêz ji hemu heyberan dike wekî neyî tê berçavêwî benda xwe jî şayenê xwe dibîne û bes.Nivîskar vê xezala jêr di destpêka helbestên Mehwî de datîne û lê belê ev dildarîya mecazîye.

*Bîywê neywê, min dadu bê dadî dekem.*
*Kuî bidatê yan nedatê ah û ferbadê dekem.*

Lê belê eger em hinekê li ser lêhurbûna çêbikîn wê ji mere derbikeve ku peywendîya wê bi dildarîya mecazî ve tuneye. Berbi rastîyekê ve diçe. Ji ber ku helbestvan dixwaze jê navêvê evînê de bi mire. Xwe wekî şagirtê Perwane û Bilbil danîye û berdewam dinale. Dixwaze îsfendîya nefsê bi tekbîra hizia terîwetê bi kuje. Piştre jî alîkarîya wîdike ji bovê cengê. Kuştina nefsê ji hêza xwe tê, Mehwî jî pîr bûye û seferekî dirêj li pêşîya wîye ku ew jî mirine. Pêwîstya wî bi zada xwedê tirsîne. Ev jî di çend xezelên jêr de dîyar kirîye.

*Bî gemê îşqim her lekn perwane ya bulbul buwe.*
*Bî gemê ya ney gemê her meşqî ostadî dekem.*
*Kuştinî îsfendîyarî nefse besteî rayî pîr.*
*Ker meded ka ya neka, lew şahe îmdadê dekem.*
*Bem nîzîkane le berme ( Mehwya ) rêkêkî dur.*

**Soran Mehwîdi teza xwe de sofîyan dike du beş**

**1- Mutesewîfî Şîslahî:** Ewin ku berbi cihana sofîgerîyê ve diçin û berhemên wan jî ew qas kurbûn têde nîne.

**2- Mutesewîfî Yaxî bu:** Bi kurî û hurî berbi sofîgerîyê ve diçin.Destpêkê ji xwe û pişt re jî ji civakê yaxî dibin, berhemên wan jî rengvedana rastîyêye. Piştre jî bi piştgirîya mînakên helbestên mehwî têxe nav sofîya yaxî bûyî. Ev jî çend mînakeke:

*Emînî şêtîye mehwî, le mektî nefsî emare.*
*Meger rehmî xuda, dem bestîka,em mare engêwe.*

Di vir de mehwî bi xwe yaxî bûye li dijî nefsa xwe sekinîye. Berbi alîyê xuda ve diçe ji bo ji rzgarbûna destê wî. Lê belê di derbarê wateya vê beyta jêr de:

*Hale bed halî le şwên û male wêranî ledu.*
*(Mehwya) ger ehlî halî mal û halm bu çîye.*

Em ne li gel Mamosta Mela Ebdula Kerîm Muderîs û Soran Mehwî ne. Belku beyta wê ji vê zêdetir radike Mehwî ketîye di nava halê sofîyan de. Ji ber vê jî hay ji cîhana aborî ne maye û ala wî wêran bûye. Piştî vê her bi xwe jî dibêje: Mehwî xem ji malwêranîya cîhanê ne xwe eger tu ehlê halî belku yezdan ev nîmete bi te bexşîye. Ji ber ku hal bexşînekî xudayîye ji bo sofî.Vê carê nivîskar tê li ser yaxîbûna mehwî a di civakê de (Berê xwe dide xelkê û civakê daxwaza vê jî ji wan dike. Ew jî yaxî bin û pişt ji dunya xwastinê berdin).[16]

*Çîye em hemu tentenew mn mnt.*
*Ewende çîye, ferxrubex krdnt.*
*Beru çunî nawê dekeî zîndegî.*
*Bederçûnî biyek debê mirdnt.*

Em dixwazin vê jî rast bikin ku (Şêx Hesenê Besî) ne sofî bû.Ji ber ku sofîgerî di destpêka sedsala 3 a Koçîde peyda buye. Tenê mirovekî Zahîde bû di 110 Kç de mirîye.Dr Marf Xezneder di derbarê sofîgerîya Mehwî de çend xalên girîng destnîşan kirîye. Behsa nivîskarên din jî na keve berdestê wî bi hurî berbi babetê ve çûye. Ji wan jî (Mehwî wekî şêxekî yê terîqeta neqşîbendîyê bûye bawerîya wî bi tevlîbûna terîqeta şerîetê bûye ne pêçewane).Ev tevlî hevîye jî wisan nebe ku di afirandina Mehwî deye. Belku hemu sofîgerên ser bi sofîgerî ew jî ser bi sofîgerîya sunî bûn. Bawerîya wan wisane ku xezala yekem rêvebirê wane karîye şerîet û sofîgerîyê bi guncîne. Berbi yek armancê ve jî bibe.

16 . Zerînkub Ebdulhusên*, "Neqdê Adebî", Çapxanaya* Emîr Kebîr Çapa Çaram, Têhran 1369.r23

Ji bilî vê Dr Maruf ji bo wê jî çuye ku Mewîdi destpêkê de Mehwî pabendê desturên şerîetê bû. Car caran jî (Wekî helbestvanekî baş sud ji sofîzm yan jî helbestên sofîzman pêşîya xwe wergirtîye. Hinek helbest diçe dinava bîr û bawerîya Sofîzim kozmus di alîyê rêbazê de li gel sofîzma îslamî di gunce). Her wiha nivîskar amaje bi paye bilinda mehwî jî dike di helbestên sofîgerîyê de. Ji ber ku (Ji ber ku karîye berhemêkî mayînde dayane di alîye sembola sofîzma îstêtîkî û romansîzmê de. Beramberî sofîzma îslamî bi sekîne bi (Mglq) û di alîyê hemu kesekê be jî tamê jê werbigire û bi çavekî bilind jî temaşe bike.

Dr. Maruf bi çend beytekê karîye yekêtîyekê pêkbîne di nav bera Mehwî û kirdgar de. Her wekû yekêtîyekî Emerê kurê Fayz ku pêktê ji (Yekêtîya dinav bera dildarû û diberê de. Yan jî di navbera mirov û Yezdan de. Ev li alîyekê, di alîyê dinde pêkhatî bû ji yeketîya di navbera xweda û erdnasên li gel cîhana berdest de. Lê belê di her du alîyan de ev yeketî rewşekî deronîye di demê sozê de. (Wucd) rudide). Belgeya nivîskar jî ji bo vê yeketîyê ev beytên hene.

*Bebê bezmî huçurî tu heramm krduwe bade.*
*Newek bişkê beneşeî meî xomarî derdî bê tuyî.*
*Ke helgîrsa le nurî bade şemeî husnî canane.*
*Neçête ser terqeî hezretî perwane dl çîbka.*

Di derbarê vî karî de Dr. Meruf dibêje: ((Pirtew yê kirdgare dilê helbestvan pêwîste di nava vê pirtewê de bi recife û yekêtîyê çêbike)).

Her di derbarê vê yekêtîyê li gorî nivîskar Mehwîdivê beytê de (Heyas kirîye sembola heyînê û hewil dide yekêtîyê li gel çêbike)). Mehwîdibêje:

*îcazî îşqe menşeî her muecîzîçkî husn.*
*Mehmude,bende, buye buwe padşa eyaz.*

Piştî vê hêzê yekêtî dinava Mehwî û xudade Dr Maruf amaje ji bo vê necîtê dike di navbera mehwî û fêrkerde heye ((Ji ber ku Pirtewa kirdgar û nehênîya di nava arîf û mehbub nabe bide bi kesekê)) Mehwîdibêje:

*Kertê bgen le gewherî dilda çi mew çi ewda.*
*Em şew çaxe lem şewda kes deda be kes*
*Heq bîjîyek gunahye mensoru heqme min.*
*Em qekh rnîşanî nedem (Mehwya) be kes.*

Dr. Maruf li gorî fikrê wî terîqet û şerîet cudane. Ji ber vê jî divê malika helbestê de Mehwî wekî Waeîzê danîye ne sofî.

*Rêgeî huda terîqetî îşqe de (Mehwya)*
*Wern û pya brun û (صلوا على الرسول).*

Bi bawerîya me ev malika helbesta Mehwî amaje bi ayeta ((قل ان كنتم تحبون الله فاتبعونى يحببكم الله)), dike. Ev di alîyekê û di alîyê din de jî ew bîr û bawerîye ku dibêje: (Elsofî Lamjhb le) bîru bawerîyekî dure ji îslamê û sofîgerîya îslamê. Ruyê nava îslamê her wekî çawe şerîet ruyê ji derveye ji ber ku (Ola tam du ruyên wê hene. Şerîet û Terîqet, çawe zana di şerîetê de çend hukm rakirîne. Her li gorî vê jî sofîyan hukm û karên dil di terîqeta sofîgerîyê de derdixin). Xorşîd Reşîd di teza xwe de girîngî bi vê daye ku Mehwî helbestvanekî sofî meznebe karîye felsefeya sofîgerîyê di helbestên xwe de bêje.(Guldestê kurê Meynûşan û eşqa xweda armanca sofîyane anîye ji derve. Ev felsefe gelek bi eşkereyî di bê beyta jêrde dîyar dibe). Mehwîdibêje:

*Tê dega herkes bika fehmî rumuzî menewî.*
*Hîcru wesle narz cennet ayetî (Laystuî)*
*Kêwî xem,wadî cefa keî krdne eşrakî îşq.*
*Pakî hewrazu nşêwî keî debê ker rehrewî.*

Nivîskar ewqas ji meseleyê hur nebûye. Tenê her wekî awirekê ji bo wî çûye ji jêgirtinê zivirîye. Mihemed Emîn Husên di nivîsa xwe de işaret bi wê daye ku Mehwî sofîyekî

mezin û xwedî evînekî di binde ne hatîbu. Ji ber vê jî nasnavê meşuyî bi Mehwî gohertîye ta ku li gel evîna wî a mezin bi guncê.[17]

Fikrê nivîskar ewe ku Mehwî jî yek ji wan helbestvanên sofîyane ku tirkan ji xwe re gihandîne ku ji wan yaxî bûne. Divê bawerîyê de Mehwîdibêje:

*Le arîfeyek pirsî hewalî mesle xu qesab.*
*Be engoştî şehadeî krd, îşareî mehkemew nayb.*

Li gorî nivîskar Mehwîdi dariştina xezela xwe de di her du alîyê ayîdyalîde çûye her xuda perestek dixwînin. Meteryalîst jî di alîyê madî û herdu cîhan dikin temamkerê yek du. Piştre jî piporî di her du cîhana de di pileya nizim û bilind de dîyar dike. Di rêbaza evîna xwe de jî wekî mamostan dike. Mehwîdibêje:

*Derî eşqm her lekn perwane ya bulbul buwe.*
*Bîgemî ya negemê her meşq ostlaê dekem.*

Her wiha di mijarek dinde peywendîya di nav bera Mehwî û Helac de dîyar dike û eşkere dike çawe Mehwî helac dike nîşana heq bêjîyê ((Djî rjîm û xwar û rêça zeman, Ji ber vê jî helac bi vî awayî di hemu wan malikan de derdikeve ku qala heq û heq bêjîyê dike)). Mehwîdibêje:

*Heta heq nasîre, her heqme menvur.*
*Weku mensurur rger bimken bedara.*
*Le heq bêjî buwe behrî ((Na Alhq)) her qesîdêkm.*
*Lebatî caîze wacb kera qelm bken qacb.*

Di vir de mehwî wekî helac tê berçavêwîdi heq gotinê de li benda heman encamê ew jî dike. Ji ber ku ((Gelek bi başî di rejîma fermanberê wî serdemî gehiştîye padaşta rastîyê bîhan. Her seza û êşa koştinê ev jî mora tawanê tîne di nava çavê rejîma osamanîyan)).Mamosta Hesîb Qeredaxî vê eşkere dike ku sofîgerîya îslamê zadeya ola îslamê

[17].IZESDDÎN MISTEFA resûl,lêkolînewey *Edebî folklorî kurdî,* weşanxaneya Aras ,ç.3 hewlêr, 2010,r , 95

ye û ser bi felsefeya metafîzîkê ye. Niha jî tê li ser kirokîya sofîgerîyê ku heskirin û eşqa sofîgerîyê eşkere dike.

Heskirina eşqê kirokîya sofîtîyê ye. Her çi bîr û bawerîya sofîtîyê heye hemu di derdora heskirin û eşqê de maye. Her wekî Mehwîdibêje:

*Leber dergahî îşqa, yeksere kes serî dana.*
*Eger petyare yek bu, bu le sud elame danatr.*

Her ev heskirin û eşqeye ku sofî di gehîne encamê. ((Ji ber ku heskirin û eşq fikirin ji bo hêza di heskirinê de mayîn)). Piştî vê tê ser meseleya seksê û meyla wê li gel sofîyan. Di alîyê seksêde qala hinek sofîyan dike ji dil di alîyê xetê de nedane û rastî pirsgirêkan hatîne. Di bersivê de dibêje: Ev dîyardeye ne tiştekî giştîye. Buyera wê jî ne merce alîyê seksê rut be.Belku li gorî sofî ciwanîya yezdan di wê deberceste be. Di alîyek din de jî belku ev eşqe ji bo meseleya hezretê Adem bi zivire ku Hewa ji wî çêbûye. Mecazîya ve eşqêjî ji nijadê nêre. Di derbarê meye de (Ev dîyardeyekî kevne hinek ji sofîyan- Abahî-Yekanî wekî (Mgawe û Qlndrî) bi dizî vedişartin û piştre jî ev ji bo hêmayekî irfanî bi taybetî dikeve soza dernîyê de. Di alîyek din de jî meî di helbestên sofîyan de hêma ji bo heskirina xudaye. Ji ber ku heskirinawê dibe sedemê soz û (Wucd) Serxweş)). Mehwîyê sofî divê derbarê de dibêje:

*Leme îxane xuda kerême derçîn.*
*Bekê beyn îltîca, bukîhe derçîn?*

Ebdula Qeredaxî karîye di çend alîyan de berbi deryaya payana sofîgerîya Mehwî bê û çend hurdekarîyekê bi destbîne. Hinek ji wan wekî pirsyarekê maye. Hinek jî wekî mînakên helbestên Mehwî palpişt kirîne. Em jî bi hêza xwe dest li ser xalên girîng danîn. Eger me karî alîyên din jî emê eşkere bikîn. Nivîskar ji bo wê çûye Mehwî yarek jî heye jine. ((Mirovek eger mirov nebê ji bo çi behsa zolfe û bru birajang dike. Eger mirovek jî nebe dibe sedemekî bê neçarî kirîbe û bike çarçêweya xasyetên mirovan de?)). Her çi qas yara Mehwîdi şêweyê jinê deye, lê belê jin sembolekî berbi yezdan ve çuye. Mehwî jî wekî gelek helebstvanê sofîyên din di xwaze bi eşqa mecazî berbi eşqa heqîqeta yezdan ve biçe. Ev sembola min di helbesta sofîgerîyê de dîrokekî kevin heye û xwedîyê xwezayekî xudayî afrênere. Ji ber ku jin ji zilam çêbuye û zilam jî bi fermana xweda çêbûye.

Di kevinde di alîye (Misirîyan) de (ayzîs) wekî xuda perastîye ev piroseye jî gehiştîye (Îştar) ji wê jî jibo (Meryem) di ayîna mesîhîyan de buye cihê gotina yezdan û Îsa li cem çêbûye)).Li gel soz û(Fna) sofîyan yek digirin. Wisan bu ku tiştên qeys bi corekî reftarî dizane û sembolekî ji bo dildar ku di nava xwede dulber derketîye. Her qese digot: Ez Leylame (Ana lîl) her heman gotina helac digehîne (Ana Alhq) Ji ber ku her duk jî di nava hebuna heskirinê de temam bûye.vê ca nivîskar tê ser xwezayekî taybetî xezalên Mehwî ((Sîyana Eşqê û eşq û derdeber)) yan jî tê deye mînak.

*Le pê herame zreî silsîleî muqedesî îşq.*
*bibî be şêr û meger helgrî le dinya dest.*

Di vir de eşq di destpêka yekem a malikê de heye. Eşq jî pêktê ji (Bibî beşêr), derbederîya wê jî dest ji cîhanê hilgirtîye. Ev ew qase mînakek din jî destnîşan kirîye.

Piştî vî nivîskarî şêweyê derketina yara Mehwî ji bo dîyar dike (Şend şêwe derketina yara hes dike şêweyekî pêktê ji kurtîya demê derketî:

*Witm: em xale çi bu her kertêk derxst.*
*witm: Daxî bu be cerk û bedlî (Mehwî) mana.*

Di çend cihek din de jî derketina yarêeşqê radigihîne wî berî pileya soz û hêza nîst. Mînak:

*Ke di detwêtewe bu tu, dekeî ewruje tu brwa.*
*Ke xu derxeî weku xur, dil weku şerunm le xor brwa.*

Di vir de jÎ derdikeve kesayeta mehwî reş dibe. ((Di ezmuna helbestvanan de tenê meşuq û eşq dimîne)). Mînak:

*Le ser tu bume pendî ealemê wtim û wtiî : Mehwî*
*Bes bê muşrîkî, bes, ya le dnyaya le mn lade.*

Piştî vê jî eşq jî dinava meşuq de namîne. Her meşuq  dimîne. ((Ezmuna wê ezmuna yekêtîye û berdewame di retkirina tiştan di rêya gehişt,na di yek de)). Mînak:

*Xeyreî wehdet lew cuda nîye, ke piret wehme.*
*Sadete kraî yek menşenî ew hamî eded.*

Bi vî awayî nivîskar ji bo eşkere dike ((Yara mehwî ne jine. Eger jin ba wê di jîyana me de ba armanc ne hêzawêye)).Emîn Şêx Eladîn Nexşîbendî, tê li ser sofîgerîya Mehwî û vê derdixe. ((Mehwî ne gehiştîye paya kemala terîqetê ku pêkbê ji îrşada mugaeq. Belku xelîfe buye û buye xelîfeyê Şêx Behadînê Kurê Şêx Osmanê Nexşîbendî)) . Mehwî pileya rêbertîyê nebû, Ji ber ku ((Eger murşîd ba wê şêxê wê destura îrşadîyê bidayê))[18]. Piştî vê bi mînakên helbestan ji mere eşkere dike ku Mehwî qasîku di jiyanê de rêberê terîqetê nebûye. ((Bedemî Hewara kesî û bê destû dike di gor panî tesawifê de)). Mînak:

*Çîbkem ne ew kesem ke kesm bê le la bekes.*
*Xoşm nekeyme ew kese ew min bika bekes.*

Ev bê rêberîye jî her di mirina Şêx Behadînde bû. Di sala1298 kç heya mirina Mehwî 1324 k ku dike 26 sal. Pêşîya vê dîrokê Şêx Behadîn rêberê terîqetê bû. Li ser destê wan bûye rêberê sofîgerîyê.Vê ca nivîskar hinek malikên helbestê ji bo me destnîşan dike ku ser bi sofîgerîyê ne. Bi wan sofîgerîyane ku tê dene û dikarin bêxin divê xalê de. Mînak:

*Koştinî esfendyarî nefse besteî rayî pîr.*
*Ger mededka ya neka, lew şahe îmdadê dekem.*

Divê beytê de (Nefs, hizir, meded û şah) hemu zarevayên sofîgerîyê ne.

Nivîskar ji me re derdixe ku sofîgerîya Mehwî ji çarçêweya Şerw daye paş. ((Ev rêya tesawifê bi rêya eşqa binav û deng çavkanîya wê ji Pêxiber (S a s) hatîye)). Mînak

[18].Hesen Emîd Thran, *Ferhengî Farisî*, Çapxaneî Sçhr,Tahran1382, r, 928.

*Rêgeî huda  terîqetî îşqede ((Mehwya))*
*Wern î pya brun û (Slwa Elî al rsul)*

Nivîskar hewla wê daye ku du miqam ji miqamên sofîgerîyê di helbestên mehwî de bi destbixe. Mînak:

*Dilî bê bare mayeî kare her kes karubarî xuî.*
*Le dunya da mufeq bu bedl tefuîçî barî krd.*

Ev beyte destnîşane ji bo miqamê tewekul. Ev beyta li jêr jî amajeye ji bo miqamê Feqir di sofîgerîyê de.

*Şukrî heq berderî, her feqre îqametgahm.*
*Ber derubarî ne sulgan û neşanîme melaj.*

Ebdul kerîm hesen ebdula di gotara xwe de (Cewhera Felsefeyê di tesawifa gulzarê helbestê mehwî de) behsa kurteyek serhildan û armanca sofîgerîyê kirîye. Hinek fikrên wî heye ku li cem wî nîne. Ji wan jî: Rêbaza yekêtî bûnê li ser destê (Ju Alnun Alsrî t 245 h) serî hildaye. Lê belê rastîya wê ew e ku ev sofîye hal û miqamên wê ji sofîgerîyê çêbûye. Ev rêbaz jî piştr (Mhî Aldîn Abn Erbî 638) wekî damezrênerê wê danîye di îslamê de her çiqas ev rêbaze geleke dîrok jî heye.

*Loxatî ême nalew ahe.*
*loxeî wa nagrê brhan*
*Ke tu derkewtî nalew grye coşa.*
*Nîye em cîlwe xeyrî berqî lamîe.*

((mehwîyê helbestvan hewar û nalîna xuroşanîya dil û deronîyê çespandîye. Di ferhengê de (Brahn Qage) çênake.

Zimanê helbestê helbestvanan wateyek kur di xwe de girtîye ji bo heskirina xwe pê bang bike)). Lê belê di rastîyê de wateya wê ye ku dofî di rewşa sozê de di gehije helwestekî

wisan ku nikare bi peyva ferhengî di deronîyê de derbixe. Her wiha di derbarê vê malikê de dibêje.

*Le padaş qseî serda heme ah û henaseî germ.*
*Kes şêtane berdm têgrê, mn berqî tê degrm.*

Di cihê vê bêje: Radestê xwedê dikim... Dibêje birqê tê de digirin ku armanca birq wate nura yezdane). Di rastÎyê de ev fikra ciwan dibêje: ((Radestî xuda dikim)) Lê belê ((Armanca biqê wateya nura xudaye)) Fikrekî kiçike û mafê xwe nedayê. Mehwîdivê malikê de me berbi rastîya zanîstîve dibe ku pêkhatîye ji biruskê. Birusk ji bargeha sehn û sar û germ û ewir pêktê. Di malikê de jî gotina sar karbîne û nefesa germ a mehwî ji biruskê pêktê. Du rê jî nîne di cihê ((Kesî Şêtane...)) bi vî awayî be ((Kesê şeytane.. = ku amaje bi ayeta wate: Yezdanê mezin bi sitêrkan komek şeytan derxistîye her ku di xwazin guh bidin nuçeyên asîman. Ji ber ku di tesawifê de rê û şêwazên cuda cuda hene,jêre dibêjin (Terîqet).Tê dîyarkirin ku di hemu zarevayan de ev peyv li gorî her terîqetekê tê gohertin. Mînak: Di terîqeta Nexşîbendî de ji bo zilamên baş û ligorî rêkeftina terîqetê ji wan re dibêjin: (Sofî). Ji xwendevanê wan ên hîna ne gehiştine pileya heqîqetê jî (فنا في الله, بقا باالله) ji wan re dibêjin: (Morîd). Ji mamosteyên wan re jî dibêjin: Şêx û ji cihê ku tê de perwerdê jî dibîn jêre dibêjin: (Tekîye).Êdî ez di xwazim di virde qala tesawif û zilamên mezin yên rêya tesawif bikim ku çawe cihên wan daye nasandin. Ez di destpêkê de dibêjim pêwîste rêyek gelek berfireh hebe, fezayek wisan mezin hebe. *((Ji xeyrî xwestekên yezdan tiştekdin nebe, çawe wê bikare bi asana bi kesek nezan re bide nasandin))*[19].Mînak: kesek were cem te û pirsek ji te bike bêje: Tama karçikê çaweye? Di heman demê de ewî kesî qet karçik ne xwaribe. Belê tê çawe bikarî jê re bêjî û lê bidî fêmkirin ku tama kariçikê eve. Eger tu bêjî şirîne başe xweşe, lê hingivî jî şirînd. Eger tu bêjî tirşe, lê simaqjî tirşe. Lê belê tama karçikê ji van cudaye a baş ewe ku tu bêjî heya tu nexwî tu nizanî çi tamek ya wê heye. Ji ber ku li gel hemu tiştên din tama wê cudaye. Ji ber vê jî cîhana tesawifê jî xwedîyê çend (Miqam û rewşekî) deronî û (Menewî) ye. Ji ber vê jî tu çiqas pênaseya wê bikî lê her tim ew veşartîye. Ew kesê ku pênaseya wê dike eger sofî be ew bi miqam û rewşa xwe a taybet pênase dike.

Morîdek yê (Şêx Alhî Aldîn Ebn Alerbî) (1165-1240) hat cem şêx û got: Gel min di êşîne, bawerîya wan bi direwên me nayên. Şêx got: Başe vê carê ji wan kesan bi pirse bi çi

---

[19].Hesen Emîd Thran, *Ferhengî Farisî*, Çapxaneî Sçhr,Tahran1382, r, 928.

tiştî dizanin hingivîn şirîne? Bê goman ew jî wê  bêjin me tam  kirîye. Tu jî ji wan re bêhe rêya mejî heya tu tam nekî tu nizanî çîye û çaweye?Lê belê ew kesên ku tesawif naskiribin hemu ew kesên ku zanayên tesawifê ne. Yan ew kesên divê rêyê de  Tesawifê wekî (zanîstekê yan jî zanîsta xweda nasî) bi cih dikin. Divê derbarê de temaleyî wan hemu ew pênaseyên ji bo tesawifê ne hatîne kirin hemu li ser bingeha (Hukmeta xweda nasînê) bûne. Dîyare ku bi rêya tesawifê xweda naskirîne. Di destpêkê de pêwîste mirov xwe nas bike, ev nasandin jî ji deronîyê tê. Ji ber ku ew kesê nekare xwe nas bike wê çawe bikare xweda jî nasbike? Ew kesê ku xwe jî naskir rêya xwe naskirinê jî asan dike.(من عرف نفسة فقد عرفة ربة) tê dîyarkirin ku xwe naskirin ne rêyek asayîye. Ji ber ku hemu kesek ne Sokratese  xwe nasbike û gehiştîye wê zanîstê ku bêje: (Zanîna min di wê tiştê deye ku ez dizanim ka ez di çitiştî de jîrim...) Ji (Şêx Kerxî) pirsîn, heskirin çîye û çaweye? *((Heskirin ne tişteke ku xelk bikare wekî dersek bêje. Belku heskirin ji alîyê heskirîyê xwe ve wekî dersekê tê gotin))*[20]. Sofî jî dema temaleyî çi tiştî bike xweda tê de dibîne. Li ber çav û dilê sofî hemu ew tiştên di cîhanê de hene neynikeke ku xwedayê xwe tê de dibîne. Tesawif jî (Heskirinek Raste) yan jî (Heskirina Xweda) ye. Heskirin jî tu nikarî bi xelkê bidî naskirin bi taybet ew kesên heskirin nekirîn. Ji ber vê jî tenê sofî dikarin qala wê heskirinê bikin, û dibêjin (Xwedayo) min ne ji bo bi destxistina Biheştê tu perstim û ne ji bo tîrên dojehê jî, belku ez ji te hesdikim û ji ber vê heskirinê ez te pîroz dibînim)). Tesawif dema ru bi ruyê astegîyan hat bêxe ber nefsê ne pesende. Sofî di xwaze ji bo xwesteka xweda xwe dinavde bibe. Berjengê xwe dike berjengê yezdan, berjeng jî bi xwe çiq dide. Her weku sofî bi xwe jî dibêjin:((فانياً عن أوصافة باقياً بأوصاف الحق)) tê wateya ku xwe çawe têxe dinav de û çawe tê de maye.

Belê tesawif ew qas bilinde ku heya di gehe pileya bild a xelatê (Meosuf bi berjengê Yezdan). Her weku di fermana Qudusî de jî hatîye *(( ... كنت سمعة الذى يسمع وبصر الذى يبصر بة الغ))*[21].Tê wateya Yezdan di fermîne: Ev benda min reftarê wê wisan lê hat, êdî ez dibim hestê bihistînê û dibim hestê dîtinê...hwkd.Sof her çiqas agahdarê xweşîya biheştêye ew qas jî ji bo xwedîyê biheştê jî di mire. Her weku yek ji endamê mezin ê cîhana tesawifê ji morîdê xwe re dibêje: ((Eger tu biheştê dixwazî her cem (Ebn Mdîf- Elam bû).

Eger te xwedîyê biheştê jî divê were cem min)). Di pirtûka (nefh al seyb) dibêje: Rêya gehiştina biheştê rêya Şerîetê ye. Rêya gehiştina yezdan jî rêya Tesawifê ye yan rêya heqîqetê ye.

---

[20].Ehmed Mihemed Por,*Felsefe mîtodî le zanîste Miroyîyekanda*, , Seîd Kakeî, Çapxaneî Mûkiryan, Hewlêr, 2013,78.
[21].*Tesawif çîye*, r 77.

Her weku min gotî, tesawif pênaseyên cuda cuda hene. Mînak: (Ebu Nesir Al Sîrac) di pirtûka (al li mih) de yek ji çavkanîyên herî mezin ê tesawifê ye dibêje: (îbrahîm Alwelîd Alreqî li ser pênaseya tesawifê bersiva zêtirî dused pirsan daye).

(Şêx Ehmed Al Şîrbas) Yeke ji nivîsakrê vê çerxê ye ku mamosteyê (Zanîngeha Ezher) bu. Di zincîra gotarên (al seqafa al eslamîye) de di Adara 1961'an de di beşê (al tesauf ende al misteşîrqîn) de dibêje: (Tesawif rêya rewşa civakî û deronîya sosyolojî û saykolojî ye).

Ez ê di vir de ji devê zilamên mezin ên vê rêyê çend pênaseyan binivîsim, lê belê ew pênasene ku yên min ecibandîne.

(Şêx Mihemed Emîn Al Kurdî (Erbîl) di sala 1913'an de çûye ber dilovanîya Yezdan. Di pirtûka (tenwer al qlub) de dibêje: (Şerîet dare, Terîqat beş heqîqet berhema wêye, heqîqet jî xweda nasîye, rêya deronîyê jî ji tesawifê pêktê).

(Al rsale Al qeşîrye) îmam Ebu Qasim Quşeyrî yekemîn pênaseya tesawifê destnîşan dike. Şêx Meruf Kerxî ji bo pênaseya tesawifê dibêje*(Tesawif rêziknameya rastîyê ye dure ji wê tiştê a ku xelkê bi destanî)*[22]. (Cuneydî Bexdadî) rêberê mezin di pênasê de gotîye*(Li gel yezdan bê bi bê peywendî)*[23]. Ji (Ebulhesenî Turî) li ser babeta pênaseya tesawifê pirsîn û got (Tesawif ne dave, ne zanyarîye û ne jî reftare xwedawendîye). Ji ber ku eger nerêt baya wê bi tekoşînê bi dest biketa, eger zanyarî ba wê bi xwendinê fêrbiba. *((Lê belê xemilandina reftarê xwedawendî yê ye. Kesek jî nikare bi rêya xwendin û zanyarîyan bi be xwedîyê vî reftarî)*[24].

(Ebu Bekir Şeblî) (861-945 Pz), dibêje: (Destpêka tesawifê xweda nasîye. Encama wê jî xweda bi kesan dide nasîn. Belê rêya heqîqetê ye û gihiştina bi bawerîyê ye.îqnakirina xweda nasîne.

Bi çend rêyan van zanyarîyan bi dest dixin. (Xezalî) di pirtûka (al minqz men al zi lal) de piştî nivîsîna ser gotara xwe û ramanê xwe, çawe wê bi gehije rastîya ku goman lê neyê kirin. Tekoşeran li ser çar grupan dabeş kirîye.

---

[22].İbn Qasm Alqşrî, *Alrîsale Alqşîrye Fî Elm Altswf*, r 25.
[23].Alahya elum aldîn .*Tzîf aloma abî hamd Mihemd ibn mhemed Al xzelî*, Mahye Altswîf, r, 65.
[24].Terîqetî Neqşîbendî, r, 54-55.

**Yekem:** Zanayên cem min ewan bixwe dibêjin bîr û bawerîya wan xwedîyê nezerê ne.

**Duwem:** Batînîyekan ew jî bawrîya wan li ser rêya telîme û çavkanîya zanyarîya wan jî îmamê mehsime ku ji wê behrê bi gire.

**Sêyem:** Dibêjin Felsefe ya wan ji mantiq û burhanîyan girtîye.

**Çarem:** Sofîyên wan jî xwe wekî xwedîyê Yezdan dizanin (Muşahde), tê wateya (Tişt dîtina di deronîyê de) (Mukaşefe) jî tê watey kevir li ser deronîyê rakir).

Lêbelê her weku Xezalî di heman çavkanîyê de dibêje: Min hemu lêkolîn kirîye, lê belê ji bilî tesawifê. Qet ewan nekarîn min bi gihînin wê rastîyê a ku min dixwest. Her yek ji wan rêyan encama wan gehiştîye rastîyekê. Lê belê a herî rast Tesawife, ez dikarim bêjim: ((Tesawif gehiştina rizgarîya rastîyê ye)).

### 1.2.3 Felsefeya Tesawifê (Oldarîyê)

Her karê ku em dixwazin divê tezê de bêjin, raste rast ev pirse derdikeve ber devê me (Erê başe Felsefe beşeke ji Tesawifê yan jî beşeke ji Felsêye??).Eger em temaşeyî Dîrokê bikin û li pey bersiva pirsê bi gerin, ew goman namîne ku felsefe di destpêkê de û di dawîyê de beşeke ji Tesawifê. Belku felsefe afrênerê tesawifê ye. Eger em lipaş mêzeyî çînên kevin bikin yên wekî (Hînd, Çînî û Misrî) piştre (Yunan û Îran). Di demê herî kevinde di nava van gelande rêyên cuda cuda yên ji bo afrênerê (Xaloq) ê rastîya cîhanê hebû. Ev jî di ayîna Bodayî a hindî û çînîde dîyarbû. Ev jî tê wê wateyê ku carnan hizra xweda kirîne. Tê dîyarkirin ku ev jî rêya armanc û cihê tesawifê ye. Lê belê di dawîyê de ji alîyê Yunanîyên kevin ve ev destkeftîyên ayîna kevin a gelan hat bi karanîn. Bi heman rêya hizirînê, hizrê wan ber bi cihek din ve birin, ji bilî cihê xweda nasîyê. Ev jî ji Pîsagor bi gire heya di gehe Arîsto. Eger em ji nava dîrokê bên pêwîste em bêjin: Felsefe ji Tesawifê peyda buye.

Lê belê eger bi babetîyane berbi pirsê ve biçin û hizra bersivê bikîn, emê bibînîn a rast ewe tesawif beşke ji felsefê. Ji ber ku rêya tesawifê tenê rêya xweda nasîyê ye.Lê belê felsefe tenê rêbazeke û felsefê tenê wî karî nake. Belku di nava kesan, mirovan, jîyana rojane de bi sosyolojî û saykolojî karê xwe berdewam dike.Me ji vê pirsyarê fêmkri û pirsyarek din kurt

heye derdikeve pêşberî me. ((Erê başe felsefe Tesawife yan jî Tesawif Felsefeye??)) Di bersivê de emê bijin em nikarin felsefê bi giştî bikîn Tesawif. Ji ber ku di felsefê de gelek kolgeh hene qet peywendîyek bi tesawifê ve nîne. Ev jî kolgehên wekî hizirîn, bîrdozî, rêbaz, civakî, aborî û wêjeyî... hwkd. Lê belê a ku dîmîne cihê pirsyarê ye. (Rêbaza Metafîzîk). Tê wateya (Bîrdozîya di derbarê ji derveyî xwezayê) Di nava wê dejî tenê çend rêbazan dikarîn bi tesawifê û hizra sofîtîyê ve girê bidîn. Mînaka wê jî wekî rêbaza (Eflaton) û felsefa wî. (Nîw Eflatîzîm), Felsefa Eflaton jî di derbarê çêbûna cut bunê de dibêje: (Giştî di beşde - Zêde di Kit de). tê wateya ku hemu ew tiştên çêbûn û hene ji (kit) çavkanî girtîne. Ev jî her ew yekitîye di tesawifê de rêzikname çêkirîye ku bi ser terqeta tesawifê ne. Tenê damezrêner û rêberên terîqetê (İbn Erebû) û (İbn Al Feraç) felsefa Eflatonî di derbarê (îpstm- zanîn) de dibêje: (Zanîn ji rewşa bê agahî, nefsî û cîhana derve çê bûye).Me heya vir zanî ku dinava felsefê û tesawifê de peywendî heye. Ev jî wisan li me dike em bi pirsîn: Erê Felsefa Tesawifê çîye??Felsefa tesawifê ew ku hizir û fikrê sofî û metesawifan digire ser bi rêbaza terîqetê. Mutesawif buye rê û cihê rênasîya fikrê her yek ji terîqatan. Li jê rê jî emê hinek ji wan terîqatan, hizir û fikrên mezin ê mutesawifan û sofîyan wekî mînakan bidîn dîyarkirin.

### 1.3. Terîqatcî û Hizir û Fikrê Felsefeya Tesawifê

Dinava Terîqatcîyan de hizir û fikrên felsefê ên cuda cuda hene. Carna jî sofî dinava terîqatê de mezin dibin û pileya erkên bilind digirin, digihin wê astê ku tiştên nû dibînin û bawerîya wan hîn zêdetir dibe. Ev jî bi çavê felsefeya mezin a sofîyan tê temaşekirin. Mînak: (Ana Elheq) Mesorê Helac bawerîya wî li ser (Yeketî bûn - Wehdetî û cût) ye. Bawerîya (İbn Ereb) jî pirsgirêka (Kit ji gelek gelek ji kit)..... e.

#### 1.3.1 Rêbaza Mensor Helac û Bawerîya Wî

Mensorê Helac sofîyek ewqas mezine ku li gorî beşek zanayên tesawifê ew sihirbaz bu, li gorî hinek din jî ew kafir bu. Beşekdin jî wî wekî sofîyekî xwedî payek mezin didîtin û hinek din jî jê du dil bun. Bawerîya wî gelek bi felsefeya tesawif û tesewifê dihat. Mînak: di derbarê têkçûn û yekîtîyê bawerîya wî bi vî awayî bû. *((Têkçûn: Têkçûn li ser daxwaza mirovane û li ser daxwaza yezdane)*[25]*)*. Ev jî dide ragihandin ku mirov di karên xwede ne azade. Ev têkçûna Helac qala wê dike mirov di keve rewşa xirap de û ji mirovatîyê jî der dikeve. Ev hemu jî dinavde namîne tenê hewara xwe digihîne yezdan. Her ev jî bu, wisan bi

[25].Stanlî Hêmin*, "Alneqd Aledebî we Medaris Alhdes",* Tercumet Ehsan Ebas- Mihemed Yusif Necim, Mueseset Franklin Almusahemet lil Tibaet We Alneşir, , r 66,Qahêre 1999.

Helac kir di dema xirabûnê de bêje, evê jî wisan bi xelkê da fêmkirin ku dixwaze bêje (Ez Yezdanim). Di encamê de li ser vê peyvê hat kuştin.

### 1.3.2 Rêbaza İbn Ereb û Bawerîya Wî

İbn Ereb, sofîyekî paye bilind bû û xwedîyê felsefeyek taybet bû. Di felsefeya tesewifa îslamî de xwedîyê felsefeya yekêtî bû. (Yeketî bûn) di destpêkê de li cem hinekan hebu, lê belê piştre li ser destê İbn Ereb hat morkirin û şêwazek taybet a nu wergirt. Bawerîya İbn Ereb ev bû. ((Yezdan û zindî yekin eger temaşeyî kesên kevin bikî navên wan Xwedayî ne wekî Lahot, Dolber. Eger tu temaşeyî yên nu jî bikî jêre dibêjin: Nasot, Bende, Dildar. Di rastîyê de bingeha hemu yan ji yek navî tê yan jî hemu wekî yekin)). Ev bawerîya İbn Erem me berbi pirsgirêka (Gelek ji Yek, Yek ji Gelek). Felsefeya Elflaton û ya rastîyan jî me bi vê pirsgirêkê ve dide girêdan. Mebesta (Yekêtî bûna) (İbn Ereb) ew ku hemu ew heyînê ku heye Xweda dinav deye. Ev bawerî dinava fîlozofên nu de jî derdikeve holê. (Spînoza) jî heman bawerî hebu. Ev jî ji ber wê ye ku ew jî kesekî sofî bû ye.

### 1.3.3 Felsefeya Eflaton û Bawerîya Tesawifê

Eflaton Fîlozofekî yunanîye dused Pz jîyayîye. Bawerîya wî ew bu ku pêwîste Yezadanek yan jî afrênerek yê gerdunê hebe. Dema ku dibêje*((Ev gerdun xwedîyê ruerdekî gelek û hertim dinava gohertinê deye. Mirov bi xwe bi xwe çêbibe jî, belku pêwîstî bi afrênerek çêkerek heye, ew afrêner jî Yezdane. Yekek bi tenêye, bê dawîye û hertim heye. Bi xwe çêbûye û li ser serê me hemuyane))*[26]. Tê xuyakirin ku ev bawerî ne tenê li cem wî heye, belku li cem hemu ayînên li ser ruyê erdê jî ev bawerî heye. Tişta herî giring di wê deye ku eflaton bi aqil û fikrê xwe gehiştîye vê bawerîyê. Ne li ser ayînekê ye ku ewê ayînê wisan bi wî kirîbe ew razî bibe. ji ber vê jî dibêje (Xweda Ezelê Ebedî) ye.

### 1.3.4 Bawerîya Muetezbil û Cabrî Li Ser Azadîya Mirovan DiÇêkerê De

Muetezî grupekin ji zanayên felsefeya îslamê. Di qalkirina meseleya ayînê de zêdtir piş bi aqil û hizirînê ve didin girêdan. Di derbarê vê de jî dibêjin ka mirov di xebata xwede azadin yan bi xwesteka xwene an jî ne azadin? Bawerîya wan ewe mirov azade bi xwesteka xwe xebata xwe destnîşan dike û kar dike.

[26].Tesawif Çîye? ,r,86.

Cabrî jî wekî grupekê ne, lê belê ew dijberî mutezîyane. Di derbarê mirov de dibêjin, mirov divê cîhanê de qet ne azadin, di hemu tiştekê de pêkhênerek li ser serê wane ku serdeste. Xwesetka wan jî (Yezdane).Em di vir de dizanîn ku di felsef û felsefeya tesawifê de hizir û rêbazên cuda cuda hene. Lê belê me çend mînakên cudakirina rêbazên cuda û hizrên cuda da dîyarkirin.

## 1.4 Pênaseya Helbestê

Pêwîste em ji ziman destpêbikîn. Ziman nîşanekî civakîye. Dema em di axivin gotinên me dîrokê çêdike. Mînak: Dîroka civakî, dîroka sîyasî û dîroka ayînî. Hinek caran jî ji bo xwestekê em bi kartînîn.

Ji ber vê jî dema em pirsan di derbarê helbestan de dikin, ev pirsyar ne ji xwe ye. Em hemu ne wekî hev pirsyar jî dikîn û ne wekî hev bersiv jî didîn. Ev aste jî sedemek yê xwe heye û ev sedem jî di heman demê de çênebûye.

Em gelek caran wisan di zanîn ku me yek nalî û yek Mehwî û yek Hecî Qadir heye. Rastîya van helbestan ew e ku em pêşkêşî wan dikin. Gelek caran ew helbestvan dibin referans (Merce), ewê ku xwe ji vê merce yê bide alîyekê yan jî qebul neke wê beramberî pirsgirêkan were. Ev encam jî çi peywendîyek bi helbestê re nîne belku ji derveyî helbestê derdikeve. Parêzerên vê mercê ji yek çavkanîyê nayên. Hinek ji wan akademîkîn, hinek ji wan pisporên wêjeyê ne. Gelek ji wan xwênerên asayîne. Hinek ji wan jî erkdarên fermîne. Belê fikrên me jî li ser helbestê ne bê alîne.Her evê bazarê wisan kirîye ku helbest nekare cihê xwe bigire. Eger em temaşeyî  çalakîyekî zimanî bikîn, pêwîste em ji xwe bawerbin ku da em sinorê wê destnîşan bikîn. Ka em bizanîn ew elemantên ku mijarekî helbestî û pexşanî ji hev cuda dikin çîne? (Birwane Jan Kûhn: Bingeha zimanê helbestê / Jakubsûn, Erkê ziman).

Helbest û pêximbertî demekî tevlîhev bûn. Ji ber ku bi helbestan qala wî alî dikirin. Zimanekî sembolîk bû daku heyînên gerdunê pê şekil bike. Di ruyê şamanîzmê de heya nihajî di hinek navçeyên cîhanê de  bi karanîn. Li yunana kevin gelek rolê wê hebû. Di zimanê ayînî de giranîya xwe heye. (Bawerî sîroda sîrodan / Tewrat). Pêximberê îslamê bi helbestna nukir tenê sîrodek jî bi navê helbestvanan heye. Ev jî giringîya helbestan di dîrokê de eşkere dike.Dîroka helbestan dîroka wateyan nîne. Belku dîroka şêweyê wê gerandine.

Ev şêwaze ziman berfireh dike yan na? Gerandina şêweyê wê dibe hêvênê giringîya mijarekî helbestê. Helbest û wate du dost/ neyarin. Pêwîstîya wan bi hev heye û nakokî jî di navbera wan de heye. Wateya wê teqandine ne wateyekî sinordare. Wateya helbesta sinordar dike koleyê xwe. Demek dikekolê ayînî demekê jî dike kolê Ayîdyolojya. Demekê jî dike koleyê netewê.Ev koletî nayê ret kirin. Ne ji ber heskirina ji helbestane. Belku ji bo wê peyamê ye ku helgirtîye. Gelek kêmxelk awirek didin helbestên Peşêw didin. Belku tu bala xwe bidî wî zilamê tu bala xwe didî rastîya helbstvanan. Dema ku te wisan kir tu Balkêşîyek zîrek jî li vî mirovî didî.Ev hişyarî hişyarîyek ne cih gir û ne guncave.Pêşkêşî demê borî kirîye. Bawernama binav û deng a Peşêw di Temoza 1987 an de bi buneya deketina yekmîn nameya Enwer Mihemed di seranserî Êraqê de belav kirîye. Li ser borîyê helbestên kilasîkî û beytên folklorî hilbijartîye. Bi hîç şêweyekî ji bo take kesan ne daye destnîşan kirin. Her ezmunekê Mehwî ji Nalî cuda dike Pîremêrd jî ji Hecî Qadirê Koy.Dema ku em ezmun û nivîsînê ji helbestan derdixîn ji derve, wê demê dibe lehîstina Ekro patî. Wate hunera zimanî. Bê çûyîna dinava cîhanê de. Ezmun mora helbestvane.Peywendî û hindirê fikrê xwe û taybetmendîyê xwe dîyar dike.*(( Helbest ezmuna mirovane  da ku destxweşî li "Min/Ziman" bike.Zimanekî bê sînor tîne tevlî xeya, hest, fantazî û xwenê dike. Tevlî wan peyvan dikeku civakê kirîne milkê xwe.Ezmun şerekî kitîye ligel kom. Hewlek  dide zimanekî li ser fêmkirinek taybet a cîhanî bi de afirandin))*[27]. Hecî Qadirê Koyî û Mehwî, her du jî derketîyên Hicrîne. Her çiqas Hecî di çavde peywendîyên wî ên cîhanî li gel yên Mehwî cudane. Em du cîhanan Keşif dikîn. Em du ezmunan eşkere dikîn. Mehwî cîhanê di xelkê di borîyekî hizrî de dibîne. Lê belê li cem hacî cîhan hîna çênebûye. Helbestvan besteya rast a civakîye.Cîhan dîtîn jî berhemekî ezmunîye. Ezmun van jî sînorê wê cîhanê dîyar dikin. Rastîya ziman dirêjîne ji bo ku grupek bikare cîhanê bibîne. Rengê spî ji bo Kurd û Eskîmokan ne haman tişt be. Ev jî di zivire ser rastîya kurdan û Eskîmoyan. Zimanê helbestê ne ji bo wê ye ku tu pê cîhanê bibînî. Belku bi xwe dibe cîhanek. Ji ber vê jî dema em qala peyamê dikin. Gelek caran em tiştekî jî nabêjîn peyama Peşêw di rêya helbestan de çîye?

Ev pirsyar ne hêsanîye em xwe bi xapînîn. Em nizanîn çi bêjin û bersiv bidîn. Belê ma heskirine, heskirina çîye a xakêye, jinê ye, niştîmane û ya  netewêye? Hemu bi hevrene? Em dikarin van hemu yan bidîn pişt grupekî kesk. Yan jî her rêxistinekbawerî bi heskirina xak, jin û netew hebe! Ji ber vê jî pirsgirêk dinava peyamê de nîne.

[27]. Marif xeznzdar, bo biray biray berêz ebdulla peşêw, ko . karwan, jimare 186 ,Hawlêr 1998.

*Du car deşê bilên Şiir peyamî nîye*
*Şiir peyamî nîye, belam delalatî heye*

Di destpêka sedsala 20 de helbestên kurdî beramberî wergeranê hatîye. Ev wergeran jî wisan kirîye ku hêsan bibe. Peyamek hebe, wekî çekekî dijî wê paşketina dîrokî bi sekine. Her di rêya helbestan de nîşa keç û kuran dike daku fêr bibe."Birayî ereb çaw reşim, tal buwebeşit tal buwe beşim".Tenê carekdin mirov dikare beramberî van helbestên peyamdêr bi sekine. Ji ber ku pêşvediçe helbestê xirap dike.Ev hêsanîye beraberî sîyasetê jî dibe û tê beramberî ayînê jî. Bi awayek dina merîfeta kurdî bi wê rêyê de derbaz dibe ku gelên din jî tê de derbaz bibin. Hişyarî tenik dibe û rewşenbîrî jî dibe diruşim.

### 1.4.1 Zimanê Helbestan û Zimanê Helbestên Mehwî

Helbestên vî rengê hunerê hemu hilgirên naveroka mirovatî ye. Weku (Gote) dibêje: (Em xwedîyê wan tiştane ku em derî pê vedikin....). Ewa ku mirov di helbestan de jî dibêje ew tiştên ku mirov pê derîyan ve dike. (Tîodur Nadornû) Di tezek a binavê (Tezek li ser helbestên civakê) ku di pirtûka (Felsefe, Mîtod) de belav kirîye û dibêje*(Naveroka rastîya helbestan tenê (kelecana) ezmuna kesan nîne. Kelecan û ezmuna kesan bi mercekê dibin huner û taybetmendîyên cîhanî bin. çêkirina amrên cîhanî jî kelecan û ezmunekî ciwan nasîya taybete)* [28] . Ev tişt jî yan mebesta kelecanê yan aqlîye yan hestîye. Bi merca (soza xemilandinê) Em hest dikin ku bandor li ser me kirîye. Cana jî tenê helbestvan sozê di xwede digire. Ev soz jî ji derveyî mijarê û dinava mijarê de namîne. Wekî teks jî zêdetir bi alîyê felsefê ve diçe. Di wirde wisan bi helbestvan dike ku ew bêje. Lê belê di gotinê de ew soz namîne. Ev jî wisan dike ku em berbi naveroka helbestê ve biçîn û ji wate û xwesteka wê fêm bikîn. Zimanê wê jî (Zimanê Helbestê) ye. ji bo fêmkirina zimanê helbestê pêwîste bi rêya zimanê helbestê bê destpêkirin. Ji ber ku dema helbestvan dinivîse û di qîre diwî zimanî de tiştên xwe vedişêre.

Helbestvan bi rêya vî zimanê peyvan di leyîzîne û li gel her du alîyan hevgirtinê çêdike. Bi karanîna hunera rewanbêjîyê xwesteka xwe naverokê çêdike.Bê goman dema helbestvan dinivîse ew çavêdinava tiştan de dibîne û dinivîse. Ewa ku dinivîse çavêdinav deye çavê ji dervejî xwênerên wîne. Helbestvan cara yekem ji bo xwe dinivîseû yekem xwêner jî ew bi xweye.

[28].Şêx Nedîm Csr û Nure Ebdula Salih, *Dastanî îman*, Çapxaneî Bînyaî, Çapî yekem, 2003, r, 56.

Lê belê ev ji bo çi û ji ber çi? Bersiva wê jî ewê ku dinivîse tenê ji bo xwe ye, pêwîst ne dikir binivîse ji ber ku yê ku yekcar di xwîne ew bixweye. Da ku bizane ew tişta dinivîse şayanê kesê ku jêre radigihîne yan jî...na??!Ev ji bo me dide ragihandin ku ewê ku dinivîse ne tenê ji kesekê ye yan jî (Ferdekê) ye. Belku berhema civakê ye. Civak jî dewrê xwe heye belku helbestvan di zimanê xwe de babet û naveroka xwe di hilbijêre. Lê belê helbestvan şaş dimîne ka wê kîjanê bi hilbijêre (Tîodûr Adronû) dibêje*((Ewa ku zextê li naverokê dike zîyanek taybete. Ji ber ku ewa dibêje hem ji bo xwe û hem ji bo civakê ye. Erê çima helbestvan ji bilî helbestvanan li ser xelkê kar dike? Eger helbestvan ne karîba kar li ser xelkê bike wê ne karîba berhemek hûnerî a xwe jî derbixe. Ew amêr û derfetên ji bo helbestê tên derxistin bi rêya zimanê wê ye. Di hemu wêjeyê de û bi taybet di pexşanê de ziman rolekî sereke heye. Lê belê ji zimanê helbestê sertir wekî vîrosekê taybet têkelî bi mijara atifî dibe. Ziman jî wekî janerê helbestê du beşe, nîşandana giştî zimana bi corekê hemu bizavê zêhnî derdixe))*[29].Her çi qas Crarn bawerîya wî ew bu erkê ru yê ji derve ê (Form) ê tenê ciwankirina mijarê ye. Qet peywendîyek bi naverok û armanca nehênî a helbestvan yan nivîskar ve nîne. Lê belê niha li gorî gelek nivîskar û rexnegiran corek dine. Bawerîya min jî wihaye û ji dil jî dibêjim ((Helbestvan di dema nivîsana helbestê de tenê peyva redîf di hilbijêre û tîpa serwa û hilbijartina curê çawenîya pirsgirêkê bikar anîye. Ji her hunerekê hunera rewanbêjî jî hilbijartîye û biçoktirîn peyv bi karanîyê di cihê sembola (Ritim) ê muzîkê de. Yan jî bi karanîna armancekî wateyî û babetîye. Yan jî bi bandora coş,xorûş, hest, û sozê xeyalê hizirîna wîye)).Eger helbestvan di nivîsînê de bazarê li gel ziman bike, wê fêmkirina armanca têkstê û zimanê wê çi qas giran be gelo? Eger helbestvanê me helbestvanekî kilasîkî be û helbest jî kilasîkî be di wê rêbazê de ziman wê çend peyvan têkelî armanca wateyê bike. Zimanê helbestên kilasîk di ruyê ji derve de gelek bi wateye û babetên wê gelek kur û zehmetin. Her çiqas helbestvan di hewildanê de be jî ji bo kurkirin û zehmetkirina armanc û wateya peyvên biçok û van peyvan birêje ser rupelê jî lê her di xwaze ji bo xwêner hêsanî bike. Sedema vê jî bi kar anîna corên rewanbêjî yê ye. Di her sê beşên (Ciwankarî - watenasî-rewanbejî) de peyvan paş û pêş dikin û bi wateya peyvan jî di lehîzin.

Helbestên kilasîkî ên kurdî (ji bilî helbestên kilasîkên hewramî) hemûyan bi kêşa Eruza Erebî nivîsandîne. Evê jî zêdetir rêya vegotinê li ber devê helbestvan ve dike û neçar kirîye hinek peyvan bide alîyekê û hinekan jî bîne bi kar bîne. Evê ji hinek din fêmkirina wan zehmetir kirîye. Ji bilî vê jî wergirtina babetên efsanewî yê kevin û qurana pîroz bi karanîne. Hinek wêne jî bi karanîne ku niha ew tişt ne mayîne. Bê goman evan hemu rêya fêmkirinê li

[29].Hadî Mihemedî, *Felsefey Mîtodî*, Çapxaneî Bînayî, çapî Yekem, Hawlêr, 2006, r 169

ber xwêner kurtir kirîne. Wisan bi xwêner dike ku pêwîstî bi komek zanyarîyên din be ku ji der veyî babeta wêjeya helbestane. Zimanê helbestên kilasîkî yên kurdî zimanê Erebî farisî û Tirkî jî dinav de heye û helbestvana bi kar anîye. Ev hemû jî pirsgirêkin ji bo fêmkirina zimanê helbestên kilasîkî ên kurdî. Her dinava helbestên kilasîkî yên Rojhilata navînde sê şêwazên dersan yên îfaekirinê heye.

(Ebdula Goranê Helbestvan) di yek dersa zanîngeha Bexda a Kolêja Ziman de gotîye: (Mehwî bi zimanê Hindî helbest nivîsîye) Ji ber vê jî şêwaza nivîsîna helbestên Mehwî şêwazekî girane û fêmkirina wê ne gelek hêsane. Pêwîste li ser bi hizirî hur lêkolîn bikî heya ku tu fêm bikî. Li gel vê jî Mehwî ser bi terîqeta tesawifê de sofîgerî bû ye di helbestên xwe de felsefe jî bi kar anîye. Di derbarê jîyana Mehwî de zêde zanyarî nîne bi taybet diderbarê keça binavê Meşûq de. Ev jî carna wisan bi mirov dike ku mirov bikeve gomanê ka helbestên Mehwî li ser eşqa îlahîye yan jî eşqa mecazîye?Ji ber wê ye ew komkirina li ser helbestên mehwî hatî kirin dîsan jî fikrên taybet yên nivîsînê wî bi xwene. Zimanê helbestên Tesawifê jî zimanekî cuda ê taybete. Ji ber ku komek peyvên taybet ê bi xwe hene. Wisan kirîye ku zimanê wê bi temamî ji zimanê asayî cudatir bibe. Dr İbrahî Ehmet Şivan, di nameya xwe a Dr î de ku bi navnîşana (Helbestên ayînî û sofîgerî di helbestên kurdî ên Mehwî de) dibêje: *((Sofîyan her di kevinde ne dixwest xelk ji rastîya wan fêm bike.Ji ber wê jî bi karanîna sembola li cem wan gelek girîng bû. Ew hal û hestên ji bo sofîyan dihat ji wan re rastî derdixist holê ku ew tiştên xeyalî û ne dîyarin. Ji ber wê jî wekî peyvek asayî nayên bihistîn û gotin))*[30].

### 1.4.2 Kurteyek Di Derbarê Jîyana Mehwî De

Em dizanîn ku di derbarê Mehwî de çend nivîsîn û pirtûk hatîne belavkirin. Ev hemu ji dibêjin Mehwî mela û zilamekî baş bû. Ji bine malekî oldar bûye. Babê wî jî Mela û zilamek baş bû, Mehwî jî rêya bavê xwe girtîye.

Mela Osmanê bavê Mehwî xelîfeyê şêx osmanê Sîracedînê tewile bû. Mehwî jî her li ser rêça bavê xwe çûye û bûye xelîfeyê Behadînê Morî yê Şêx Osmanê Tewêlî. Di derbarê sala ji dayîk bûna wî de jî li gorî Emîn Zekî Beg, Kake Felah û Eladîn Secadî de cîyawazî heye. Lê belê cîyawazîya wan jî di çend salekê deye ku ew jî di sala (1836,1831,1836) Z nî ye. Di derbarê sala koça dawî a Mehwî de jî Mihemed Mela Kerîm di dîwana (Bêxûd) ê helbestvan de ku bi xwe komkirîye rêkxistîye û li ser nivîsîye. Sala mirina wî li gorî Ebcedî

[30]çavkanîya Pêşî, r, 174

dirêzikên helbestên bêxûd derxistîye û li gorî wî Bêxûd sala mirina wîdivê rêzikê de daye dîyarkirin. Ligorî rêzika helbestê mirina wîdi sala (1324 k) yanî (1906)Z de ye.Ya herî giring ew ku eşkereye Mehwîdi navbera nîvê Sedsala 19 an û heya di gehe serê Sedsala 20 an de jîyan kirîye. Bê goman pêwîste mirov di derbarê jîyana her nivîskarekî yan jî helbestvanekî dîrokî de hinek agahîyan bizane da ku bi awayekî baş ji wan fêm bike. Eger me bi zanîya Mehwîdi kîjan salê de jîyan kirîye wê biba sedemê xilas bûna goman û du dilîyê. Em dizanîn ku ew qas dîroka Mehwî tê de jîyan kirî kesekî oldar, sofîger û derwêş bû ye. Bi taybet jî linavçeyên wekî Tewêle û Biyarê kirîye. Mehwîdi wan navçeyan de wane li ber destê melayan xwedîye û Feqetî kirîye. Goman di wê de nîne ku Mehwî ketibe dibin bandora heyînên wan navçeyan. Linavçeya Hewreman jî Terîqetî û Neqşîbendî temam kirîye û cihê xwe tê de girtîye û tesîrekî zêde hebû ye. Mehwî çûye dinava terîqetan de wekî bavê xwe bûye rêberekî bar giran divê asîmanê tejî mijde. Em di vir de wekî pêwîst nikarîn biçîn dinava jîyana Mehwî de. Tenê em divê tezê de dixwazîn bizanî ka Mehwîdi kîjan zemanî de jîyaye û li cem kê waneyên Terîqtê wer girtîye. Tenê em dixwazin bizanin ka bi ser kîjan Terîqetê bûye û ji kîjan çîna civakê bû ye.

## 2. MehwîûTesawif

### 2.1. Mehwî û Tevlîbûna Wî a Bi Tesawifê Re

Wekî me dayî dîyarkirin jî Mehwîdi serdemekî wisan de jîyan kirîye Mirovên wî demî hempaqij û hem pîs bûn. Di alîyek din de jî di demê wî de, mirovên baş û têgehiştî ayîn perest jî di cîhne de zêde bûn. Ew bi xwe jî ji bine malekî xweda perest û heq perest bu. Bê goman evan hemu ya bandorekî zêde li ser mehwî kirîye. Wisan bi wî kirîye ku ji xwe bi pirse çîye çi bike û çawe dijî çawe hizir dike û çawe dibînî??? Dema ku mehwî beramberî van pirsan hat canek di singa wî de destpêkir. Destpêkê de didilê xwede biryar da pêwîste ber bi ku ve biçe û piştre berê xwe da terîqetê û êşkêş. Dest ji cîhanê berda hemu tiştê xwe da ser dilê xwe ji bo ji tiştan fêm bike.Weku divê beytê de gotîye:

*Lem behrî fitne belkî necat bida xuda.*

*Dawênî be xuda bigire berde naxud.*[31]

Di vir de mehwî cîhanê wekî deryayekî tijî belaû pirsgirê dizane. Her divê cîhanê de kesekî wekî rizgarker nizane ji xeyrî xwedê. Dibêje: Divê cîhana te jî xirabî de, ji bo rizgarbûna xwe tenê rêya xweda perestî bigire. Ne guh bidî kesan û tû bêjî ewê min xilas bikin.Li gorî min Mehwî ev parçeya helbestê ji bo destpêkirina rêya xweda perestî, terîqet û tesawifê nivîsîye. Di parçeyek din a helbestê de jî dibêje:

*Bê kes minim, Kes le zubanm biga nîya.*
*Hem dem xuda ne nasn û dem pr le ya xuda* (*d.m.r.36)*[32]

Divê rêzikê de tê dîyar kirin ku Mehwî qala kesên serdema xwe dike. Ewan wekî xweda nezana di de dîyarkirin. Her çiqas navê xweda li ser devê wane jî lê ew her dîsan xwezayê xirap dikin. Di rêzika duwema paş de jî hewara kesên ku soz didan û bê wijdanîyê dikin dikir. Di rêzika pêncem de jî dibêje:

---

[31].İbrahîm Ehmed Şiwan, *Sofîgerî,* Çapxaneî Wezaretî Perwerde, Hawlêr , Çapa yekem, 2001, r, 364.
[32].Mela Ebdulkerîm Muderîs, Muhemedî Mela Kerîm, *Dîwanî Mehwî*, Çapxaneî Ofsêm hsam, Çapî duwem, 2003, r,36.

*Lutfê be halî min ke û tm, ne witî be qar.*
*Tû şêxî û eminş şêxî na xuda.*[33]

Êdî Mehwî piştî hemu wê bêçareyî yê berê xwe dide yezdan û dibêje: ((Min got ji halê xwe acizim tû min qebûl bike. Lê belê ewî bi acîzî got tu bi dîmen şêxî lê xweda perestî. Ji xwe ez şêxekî pak û başû rizgarkerim lê êdî ez û tu li hevnakin tenê bi vê nebe ku tu bi dilekî pak bê li cem min daxwaza dilşewatî û dil pakîyê bikî wê demê ezê goh bidim te. Eger peyva (Baxuda) be ba xud a = xweda perest) wateya wan berhev bikî wê peyva (Naxweda) der bikeve. Peyva (Keştî ran) eger tu wateya wê li hev bidî wê wateya yan jî daxwaza rigarkirinê der bikeve. di be ku mehwîdivê rêzikê de berê xwe dabe murşîdê xwe. Belgeya vê jî daye dîyarkirin ku ew jî peyva (Şox)e.

di dawîya rêzikê de jî qala xirabîya xelkê dike. Xemê ji wê dixwe ku her tim li pişt direwan sondê dixwin bi navê xwedê. Lê belê di dawîya rêzika heftem de rêyek ji xwe re destnîşan dike: Rêya yek xweda perestîye û cîhan xwestine. Li gorî wî eger bi wê rêyê de biçe wê her di şevtarîya xwe de bi mîne û wê ji tîrêjên heskirina yezdan bi mîne. Rêya duwem jî heskirina yezdan ku divê rêyê de xwe winda dike. Tenê wê xweda li bîra wî bê. Dibêje:

*Ta volmetî û cud terîkî le nurî eşq.*
*Sêber nema hetaw. ke (Mehwî) nema, xuda.*[34]

Mehwîdivê rêzikê de qala du cîhana dike. Cîhana yekem cîhana xweda perestîyê ye. Ligorî wî ev cîhan: Tarîtîye, heskirina eşqa xweda nasîyê bi ronahî danîye. Wisan dizane cîhana xweda perestîyê tarîye, ji ber ku ronahîya heskirin û eşqa xweda tê de nîne. Cîhana duwem jî cîhana eşqa xweda ye. heyîna xweda cîhana tesûfe. Ev giştî jî di dawîyê rêzikê qal kirîye. Nivê rêzika yekem qal qala cîhana xweda perestî û tarîtî dur ji ronahîya eşqa xweda dike. Rêzika duwem jî qala cîhana eşqa xweda dike. Tê dîyar kirin ku mehwî ew rê girtîye ji ber ku navê xwe di rêzikê de anîye ser ziman û ev wekî belgeyekê jî lê hatîye.Li alîyek û li alîyê din jîdivê nîv rêzê de dîyare mirîye. Mehwîdi vir didide dîyarkirin ku xwe wekî sîberê lêkirîye û yezdan jî wekî tavê lêkirîye.

---

33.Çavkanî pêşî,r.37.
34.Çavkanî pêşî,r.38.

Dema tav derbikeve sêber jî namîne. Mehwî gelek ji xweda hes dikir û rêya eşqa wîdigirt. Wisan kê hatî bû, êdî kesayeta xwe ji bîr kir tenê xweda li bîra wî bu.Heya vir me zanî ku Mehwî çawe ketîye dinava Tesawifê de. Êdî ka em bizanîn dinav tesawifê de heya kuderê çûye û gehiştîye kuderê. (Şêx Ebdula Neqşîbendî) nivîskarê pirtûka (tesawif Çîye?), dibêje: ((Yekî wekî min bi vî awayê Mehwî xwe dinava helbestan de daye û jê derketîye.Mehwî ne gehiştîye Kemalê terîqetê tiştên rast pêk hati be))[35].

Lê belê hemu ew nivîskarên ku di derbarê mehwî de nivîs nivîsandîne dibêjin: Mehwî Xelîfeyek bu ji xelîfeyên Şêx Behadînê Şêx Osmanê nexşîbendî. Tê dîyarkirin ku dinava bazara tesawifê de xelîfe nunerên şêxa ne. Ew kesê ku li cihê şêx dirûne jê re dibêjin cêgir. Ji wî kesê ku di rêbaza terîqetê de gehiştîye destura rêberê rast jê re dibêjin Mûrşîd. Du corên xelîfeyan jî heye. Bi xwe terîqetê baş nas dike, ew kesê ku çavêwî vekirîbe û li ser daxwaza şêx ew di anîn dinav terîqetê de. Di bî morîd (Ji wan kesên ku dixwaze biçin nav Terîqetê de dibêjin). Corek din ê xelîfeyan heye ku hîn pile bilindtire, ew jî li ser daxwaza şêx Teweccuh xilasbike erkê bilind digire.

Kesên morîd dema morîtî xılas dike dibe (Fena), ji wir jî derbas dibe dibe (Beqa). Piştre êdî muleta îrşadîyê dide wî û ew dibe morşîd dibe mamosta û rêber. Morşîd jî dibe du cor (Kamil : Bê kêmasî) û Mukemelî. (kamilî), ewe ku xwe gehandîye pileya tesawifa (Beqanî). Lê belê hêza morşîdî û mamostayîyê nîne nikare waneyan bêje. (Kamil û Kamilî), ewe ku xwe gehandîye pileya (beqa) dibe mamosta,morşîd û rêber.Mewî bê goman xelîfe bû, belgeya Morşîdîyê hebû. Lê belê ne geheştîye wê pileyê bibe îrşad, daku Morîd û Xelîfe hebe.Belgeya vê jî ewe ku her di rêzika helbesta xwede jî dibêje.

*Çbkem ne ew kesm kesm bê le la bekes.*
*Xoşm nege îme ew kes ew mn bka* bekes. (d.m.r.187)

Dîyare Mehwîdi virde bê bawe bûye û nizane çi bi morşîdîya xwe bike. Ewê ku hevaltîya wîdike ne ew kes bu ku ew bike kesek. Di virde xwesteka wî ewe ne gehiştîye pileya Mîrza.

---

[35].Tesawif Çîye?, r, 510

Her wiha morşîdîya Mehwî ew ne gehandîye wê pileyê kesên din werin cem wî û ew bibin morî û wan bi gehînin kesan. Di rêzika çarem a heman parçeya helbestê de berê xwe dide deronîya xwe û hewarê li derdê xwe dike û dibêje:

*Lêwî be pirsîş çi nexûş ne pişkuwand.*
*Dirda tebîbî ême ke nadda dewa be kes.* (d.m.r.188)

Tê dîyarkirin ku xwesteka tebîb ewe derd û nexweşîya Mehwî li cem morsîde. Ewî jî ew  rê ne daye ku mehwî pê bi gehije aramîyê.

*Le nakes karya, xakim beser ruî beba emurm.*
*Xuda! tu bi mêjênw ta leber qapî kesî demirm.* (d.m.r,262)

Ev jî ew çaxe ku Mehwî ketîye, temenê wî çûye û ketîye ber salên kal bûnê. Bê goman Mehwî mela bû, wane dida feqeyan. Evê jî wextê wî gelek girt, ne karîye wextê xwe hemuye bide terîqetê. Dema ku hîs kir temenê wî hemû diçe çû cem mamosteyê xwe û berdewam bû li ser xwendin û nivîsandinê. Di heman demê jî xerîkî vexwarina şerabê ne jî. Dema ku tê bi ser hişê xwe hawar dike babê xwe û wê bêkesîyê û dibêje: ((Min hemu temenê xwe bi karê ne bêkesîyê ve bir, kêmek maye wê temam bibe. Ey xweda tu tenê desthilatdarî de bi mijîne da ku ez li ber derîyê wî de bimirim, xwesteka wî jî ewe li ber derîyê (Morşîd) ê xwe de bi mire)). Di heman rêzika duwem a xezelê de dibêje:

*Bezayî çuwe le (Malaenî) yan weqtim hemu yenî.*
*Debê weqtî le (Biwaluqt) bixwazim datîya bimirm.* (d.m.r.263)

Ev jî her hewara wîye ji bêkesîyê û vale çûna temenê wîdi ber karên hîç de. Di xwaze kesekê bibîne ku xwedî demekî be û dinava demê wî de bi mire. (Bwaluqt) di tesawifê de ji wan kesan re dibêjin, xwedî payekî  bilinde di terîqetê de. Di virde Mehwî qala mamosteyê xwe jî dike.Li gorî fikrê (Emîn Şêx Eladîn) piştî mirina (Şêx Behadîn) mehwî bê mamoste bûye, di vî demîde Mehwî bi melatîyê ve mijol bûye û hîn daha zêdetir xwe bi melatîyê ve daye girê dan ji tesawifê dur ketîye.

Li gorî min Mehwî heya mirinê jî bi tesawifê ve mijol bûye. Piştî mirina Morşîdê wî jî morşîdek dine hebû. Li gel wî bi terîqetê ve xerîk bûye. Ev moşîdê nu jî (Şêx Behadînê kurê Behadîne) ciwanek bû. Belgeya vê jî di çend rêzikên helbestên Mehwî de heye. Ev xezela wî jî bi temamî liser morşîdê wî ê nûye.

*Dilî birdim le berîkî taze,ser le niwê.*
*Mubarek bê del sewdayekî keî kewte ser le niwê.*(d.m.r.359)

Mehwîdi destpêka vê xezelê de (Le niwê) kirîye redîf. Ev jî fikrê me dibe liser wê ku, her çi qas Mehwîdi pêşde liber destê yekîdin fêrbûye jî dîsan ew hemu dubarekir. Liber destê mamosteyê xwe ê nû fêrî xwendinê bû. Morşîdê wî ê destpêkê buyerek bi serde hat û çû. Dîsan dubarebuna hema bûyerê re dixwaze morşîdek din bide destnîşan kirin. Ev jî dibe belgeyek ku morşîdek din wane daye mehwî. Dîsan di rêzika serî de jî dide dîyarkirin û dibêje: Şoxekî Taze (Tê dîyarkirin ku daxwaza wîdi vir de Şêx hîsamedîne ew jî şêxekî ciwane). Dilbir dîlberek ciwan êdî li dil pîroz be eşqek din û nû) Mehwîdilê xwe daye dîlbera nu, her çawebê xweş bûye û dîl bûye. dibêje (Le dil pîrozbê ew sedaye tazeye) wate: (Li dil pîrozbe ev awaza nû). Ev jî belgeyeke ji bo dîlgirtina Mehwî a ji bo dîlbera nu ya ciwan. Xwesteka wî ew ku eşkerekirina Mprşîdê nu Şêx Hîsamedîne. Êdî Mehwîdi rêzika duwem a xezelê de dest bi pesindayîna dîlbera nu dike. Di rêzika sîyem de dibêje:

*Benaz îşue pak erwahî pakanî mosexxer kird.*
*Be xemze xagiranî dabe ber tîrî never le niwê.* (d.m.r.359)

Di vir de Mehwî peyva (Xatir), dil û tilîya temaşekirinê di de dîyarkirn. Dil dide pişt xwe, kesên din jî ji ber ku bi kom daye dîyarkirin nezerê dide pişt dîlberê. Ev jî tê dîyarkirin ku di tesawifê de dema Morşîd Tewecuh dike. Berê xwe dide dilê Moîd bi temaşekirinê paqij dike. Ev jî belgeye ke mehwî ji îrşad girtîye û dubare dike. Êdî ji bo me eşkere dibe ku di rêzika pêncem a xezelê de dolbere nû bûye morşîdê mehwî. Dibêje:

*Bebê le elî şîfa bexşî birînî dilî dekat merhem.*
*îşarey çawî dekolêtewe daxî lenuî.* (d.m.r.374)

Di vir de Mehwî peyva (Dekolêtewe) dikele tîne ser ziman. Ev jî eşkere dike ku di demê borî de birînek bi vî awayî heye, vaye dîsan ew dîlbera nû dubare di kelîne. Her di xezelk din de dide dîyarkirn dîlbera wî şox û ciwane, weku dibêje:

*Le rê ew şoxe da xom kirde xak û pê nena pêm.*
*Desa xakî hemû elem beser xoma ekem înkem.* (d.m.r.273)

Eşkere dike û dibêje: (Di rîya vê dîlbera ciwande min xwe kir xak xist dibin pîyan de, bes ji bo wê ye ku pêl min bike). Xwesteka wî ewe mirada xwe ragihîne. Lê belê dîyare ku vê yarê ev ne kirîye, ji ber wê ye dibêje: (Êdî ez ê xaka hemu cîhanê bi serê xwe de bikim ji ber xema ka ezê çi bikim û çi başe ez bikim). Ev ji dibe ku Mehwî tenê xwelî serî kirîbe karê xwe,ji ber ku yekem car ewî xwe kir xak û yar jî bi ser wî de derbaz bû. Dibêje:

*Demîke şarî pir şurî mehbetman û xemûşe.*
*Be qanûnî tecenûn Şurşê înşa ekem çîbkem.* (d.m.r.274)

Di vir de mehwîdi nîvê rêzika yekemde (gûl) ê wekî terîqet, tesawif û rêya eşqa xweda danîye. Hewar dike, ji ber ku Mehwî peyva (Erê) anîye ji bo karbîne. Hewarek ji destê wî gehiştîye hêvîyê. Karê wî jî (Çibikim) e û li gel(Erê) jî guncandîye wekî ku bêje: (Ji bo ez xwesteka xwe bi te bidim fêmkirn, Tu çi dixwazî? û Tu di xwazî ez ji bo te çi bikim). Dibêje: (Heware, ji mereqa bendê mayîna destê te! Erê eve ji mêjdeye min rêya gehiştina te girtîye lê ez na gehijim te. ez çi qas diçim lêna gihêm te. Başe eger ez her divê rêyê de biçim bi hêvîme tu jî her divê rêyê deyî. Lê belê ka ji min re bêje eger ez ne gihêm te û tu li gel min neyê ka ezê çawe divê rêyê de berdewam bim. Hêza min namemaye ji bo ez wê tamê ji te bigirim. Eger ez gehiştim wê tamê ê dî pêwîstîya min bi çi tiştî nîne ji bo ez berdewambi divê rêyêde. Belku tu bi xwe jî ji vê tamê durî rêya te ez hîs nakim her diçim. Pêwîste ez çi bikim? Di rêzika duwem de jî heman şêweye. Mehwî tenê şopên xwe gohertîye. Vêcarê xwe kirîye bilbil terîqet û rêya gehiştina yezdan jî kirîye Çil. Gehiştina yezdan û hêvîya xwe jî kirîye bêhna gulê. Ev şibandine bi ciwanî rêk dikevin bi taybet (Derketina gul) ê û (Xwe nîşandana yezdan bi salek a terîqetê). Bilbil ev rê hemû qut kirîye,hatîye ser rêya çil ji bogulê bibîne. Eger gulê nîşanî wî neda û ew nebîne êdî bilbilê çike her li ser rêya çil bi mîne. Xwesteka wî wiha lê tê. ((Min hemu ew rêya bi êş û tejî keder girtîye ji bo ku ez rûyê te bibînîm. Eger tu jî xwe nîşa min nedî ê mayîna min a divê rêyê de çi feydeyê wê heye ez çi bikim ?!)).

Divê rêzika xwarê de jî Mehwî wisan bi me dike ku goman bikeve serê me. Ew bi payekî bilind gehiştîye tesawifê, ew jî li ser miqama (Fena û Beqa) bu. Goherîna nasnavêwî jî ji (Meşû-Birjawe) dibe ku mehwîdiwî demî de gehiştîye vî meqamî. Lê belê ji ber çi li ser vî meqamî ne maye heya dawî berdewam ne kirîye. Ji bo vê ez vedigerîm ser fikrê (Emîn şêx Eladîn) dibêje: Mehwî piştî mirina bavê xwe êdî bi karê melatî ve xerîk dibe û ji tesawifê dur dikeve. Wekî (Geylan Xalidî Nexşibendî û Zenunî Misrî) jî dibêjin: Ewê ji meqama fena fêmbike êdî nazivire, tenê xwedîyê meqamê ji terîqetê di zivire. Rêzika wê jî wiha dibêje:

*Ke dildetewête bu tu,dekeî ew roje tu birwa.*
*Ke xû derxeî weku xor dil weku şewnim le xû birwa.* (d.m.r.67)

Her du rêzikên helbestê bi vî awayî li hev didin. Şêweyê yekem wiha ye eger (Dekeî ew roje birwa) Peyva (Birwa) divê rêzikê de tê wateya (Bawerî). Wê demê rêzik wisan lê tê (Ewro tu birwa dekeî?) (îro tu bawer dikî) Bêgoman eger di şêweyê pirsyar debe jî wateya rêzikê wiha lê tê. Mehwî berê xwe dide mamosteyê xwe ku xwesteka wî yezdane: Ez evîndarê te me min her tişt ji bo te kirîye û dikim. Lê belê tu wê wê rojê ji min bawer bikî ez dilê we wekî rojê ji tere bi şewqînim. Dilê min şevbe her tîrêjên roja te lê bixe wê her wekî xwe nemîne. Tê dîyarkirin ku ev jî meqamê (Fena) ye. Lê belê Mehwî ne gehiştîye mamostetîyê. (Tu tenê wê demê ji min bawerdîkî dema ku ez Fena bim). Lê belê eger (Dil ji bo te di kewe) dil te bi xwaze baştire ji wê xwestek û wateyê.Eger wisan jî be wateya rêzika yekem pêwîste wiha be. (Tu wê rojê ji min bawer dikî dema ku dilê min ji bo te bi hele). Lê belê a başe ewe tu bêjî (dilê min dihele ji bo te). Bê goman eger bi vî curî be nabe pirsyarî be yan jî wekî gehandina peyamekî zanyarî be ji bo mamoste. wekî mamoste ji vê ne agahdar be. Lê belê wateya armanca rêzika din jî eve: Eger em bêjin mehwî gehiştîya miqama (beqa) a piştî (Fena), lê ji wir jî derbaz kirîye gehiştîye (Halî). Êdî bi vê jî nesekinîye ew rewşa winda bûyî dawî lê ne hatîye. Di dema rewşa fena tîyê de meşûq xwe nîşanî wî da. Meşuq wisan lê kirîye xwe winda bike, meşuq jî ji bo wî ji vê rewşê rizgar bike xwe nîşan dide.Dilê wî ji wî vebû, Meşuq bi dilê xwe dibêje: (Dekeî ew rojey tu birwa) wekî wêye hevalek bêje: (Wê roja wê rojê jî were) yan jî (Ya xwedê her çiqas zube tu here) Ev jî piştî miqama (Beqa) û jîyana li gel yezdane. Ev jî wisan bi me dike ku em bêjin Mehwî rojek ji rojan gehştîye vî meqamî. Tê dîyarkirin mehwî zêde di vî meqamî de nemaye. Di dawîya vê rêzikê de heman meqam dike û hêvî dike dibêje:

Xwezî ew roj dubare bibaya û ew xweşî bihata dîsan dilê min ji bo te bi helyaya. Ew roj dubare bibaya tu wekî rojê li ser min derkevî û ez jî wekî berfê bi helim.Di vir de ligorî min tiştek ji bo me der dikeve holê Mehwîdi destpêkê de çawe bû û çawe ketîye dinava tesawifê de û gehiştîye çi.

### 2.1.1 Mehwî û Tevlîbûna Wî a Bi Felsefê Re

Çûyîna di nava Felsefê de wisane ku weku keştîyek çûye di nava deryayê de. Heya tu di gehijî peravê deryayê her ditirsa nuqîbûna keştîyê deyî. Felsefejî bi heman rengîye. Dema tu di kevî dinava felsefê de jî mirov her di tirsa nuqîbûnê deye. Eger tu deryavanekî zîrek bî tu wê keştîya xwe bi serkeftî derbazî kenarê deryayê bikî eger tu ne wisan bî tu wê bin av bibî û bi xweniqî.Mehwî jî çûye dinava Felsefê de û dinava wê deryayê de melevanî kirîye. Dema ku çûyî dinav de wê demê temenê wî jî mezin bû û xwedîyê zanînên baş bu. Lê belê evê tiştê wisan bi mehwî kir ku biçe dinava felsefê de ku li pey rastîya tiştan bi gere, fêm bike û fêr bibe. Belku Mehwî bi çavekî rexneyî û renxnegirtinê çûye dinava felsefê de. Xwestîye xeletîyên felsefê bizane û serneketina felsefê di rêya gehiştina heqîqetê de eşkere bike. Mehwîvê jî di çend rêzikên helbestê de anîye ser ziman û ev rêzikên helbestê jî dibn belgeye a rastîye. Ev jî fikra min bu. Mînak: dibêje;

*Dil le îdrakî heqîqet bê beşe bê daxî eîşq.*
*(Mehuya) dana debê bem çawe bînayî bkam.* (d.m.r 275)

Divê rêzikê de mehwî gehiştina bi heqîqetê pişt bi rêya karanîna aqil û felsefê ve girêdayîye. Berê xwe dide dil û tesawifê, her destpêka rêzikê de bi dil destpêdike û dibêje: (Dil na gehije heqîqetê eger singê eşqê pêve nebe).Tê xuyakirin ku xwesteka wî li ser heqîqetê eve Yezdane bawrîya bihebûna yezdan, armanca wî (daxa eşqê) ye. Bi dil rêya tesawifê û gehiştîye pileya (Meqama hal) eger dinava tesawifê de ewê gehiştibe pileya hal ji wan re dibêjin (daxî dil û ji dil). Di nîve rêzika duwemde mehwî fikrê xwe ê li ser felsefê û tesawifa îslamî dide dîyarkirn û dibêje: (Ew kes zaneye pêwîste li ser meseleya xwe bi rêya hizirîna ji dil lêkolîna bike ne bi aqil û heqîqetê li ser rastîya lêkolîna bike). Êdî mehwîdi rêzikek dinde îspat dike û dibêje:

*Le her cêyek helê xorşîdî eşqî gul roxan (Mehwî).*
*Eger eqlî bib, lew cîge awingî eqlî çibika?!.* (d.m.r.48)

Wiha dibêje; eger eşq berê xwe bide kê ê dî aqil di serê wî de namîne. Lê belê em dizanîn felsefe komek (Mesheb û Dibistane), rêbaz û pirtûkxaneye her yek bi corekê diçin. Her dinava felsefê de jî çend cor beş û babet hene ku her yekê taybetin. Lê belê her bawerîyek jî peywendî bi hevre jî heye.Mînak, eger fîlozofek di rêbaza Metafîzîkî de bawerîya wî (Rîkewt) be, her bawerîya wî fîlozofî bandorê li ser rêbaza (reftar dike). Yan jî di rêbaza beşên din yên felsefêde, mînak: (îmanûîl kant) ê fîlozofê (Moral û Metafîzîka) a Elmanî, bawerîya wî bi yezadnekî afrêner û endazyer heye. Di derbarê rêbaza reftarê de û bawerîya metafîzîkî de bawerîya wî wihaye; Mirov komek erkê asîmnî li ser milaye pêwîste bi cih bîne. Ev jîdi rojava de bi vî awayîye. Lê belê felsefe di (Şerqê ) rojhelat de bi corek dine. Gelek giringî daye rêbazên wekî Metafîzk, felsefeya Ayîdyalîzm (Sentezlîzîm), rêbaza esas (Emperyalîzm), (îngztansyalîzm) û rêbaza mirovî cîhanî û serdema jîyanê. Felsefeya giştî rojhelat jî ji metafîzk bawerîya asîmanî û xweda û ayîn pêktê. Rojava jî heya serdema (Rewşenbîrî) her wisan bû.Lê belê piştî vê serdemê şoreşa rewşenbîrî û (Modernîzîm) û (Post Modernîzmê) felsefe ji asîman hatxwar ket ser rûyê xwezayê. Ket dinava jîyana civakê, xwendevanan, nivîskaran, helbestavana û hunermenda de.Ji bo me tişta herî girîng a divê tezê de ewe em bizanîn Mehwîdi felsefê de bawerîya wî ser bi kîjan rêbazê bû. Bê goman li ser bawerîya Mehwî gelek nivîs û gotin hene. Yek ji van nivîsan dibêje bawerîya wî mezheb û rêbazên cuda cuda bû. Her yek dibêje ser filan felsefêye yekek din jî dibe ser felsefeyek din. (Hafizê Şîrazî) jî li ser (Ayîdyalîzmê) danîye û hinek jî li ser (îgzstansîlîzm) danîye. Mehwîdivê rêzikê de dibêje:

*Tûwî ser xistûwe bin xake, ser efrazî ber.*
*Her le rêgeî teleba bu serî dana, dana.*(d.m.r.67)

Di vir de Mehwî me di be ser felsefeya (Hîpiryalîzmî Nîçeyî), (Tirs), (Xwestina Hîs), (Fîrîdrîk Nîçe), (îgzstansîlîzm), (Haydîger), (Xwestina Mayînê) û (Xwestina Jîyanê). Haydîger dibêje: (Ev darar ruberê wê ewqas mezin bûye gehiştîye asîman. Ev jî wisane ku rayên wê ketîye kuranîya erdê. Zilamê zana jî ew kese mînak ji vê pendê girtibe û wekî vê darê jîyan bike. Eger bi xwaze bi gehije bilindîyê pêwîste serê xwe dayne û bi nizmî biçe.

Ev jî heman rêzika (Nîçe) ye ku dibêje: (Dar her çiqas bilindbe û gehiştibe runahîya asîman ewqas jî rayên wê çûye dibin tarîtîya erdê de). Her wiha rêzika mehwî jî heman armancê di xwaze rabigihîne. Ji bo mayîna jîyanê û xwesteka jîyanê. Mehwî jî dibêje: Eger tu dixwazî bijî û dixwazî bi gehijî bilindîya asîman pêwîste tu jî wekî kesê zana serî danî, her wiha kulan nade her ji bo zanînê hewil dide. Em di karin rêzika Mehwî bi alîyek din ve jî bibîn û bêjîn. Eger tu bi xwazî bi gehijî hêvîya xwe, te serî û jîyana xwe jî da xwe wekî kesekî bi zerer ne zane. Ji ber ku kesên zana jî wisan dikin. Eger em bi ser tesawifê de jî bibîn xwesteka wî ewe hêvîya xwe gihandina yezdane.Di meseleya zanîn û nasîna (Yezdan) de ew ji di çarçuveya felsefeya (Wicutyet) û (Rebubyet) de dibêje:

*Zatim nîye tuxn be sifatî kewim be eqil.*
*Ruhim çuwete surî zat er bikem be can.* (d.m.r284)

Dibêje: Ez naxwazim û newêrim bi rîya aqil li ser sifetê yezdan lêkolîna bikim. Naxwzim bi rêya aqil bizanim û wî nasbikim. Di rêzika duwem de jî Mehwî pena dibe ser tesawifê. lê belê di wirde jî dibêje: Eger ez bixwazim bi vê rêyê ji te fêm bikim ezê rihê xwe danim ser û ezê têk biçim. Dema ku tu yezadan nasdikî tu bi gehijî pileya Fena heya tu bigehijî wê pileyê ruhê te namîne û ruhê te ligel ê yezdan têkel dibe. Fikra min jî li ser helbestên fîlozofan û bîrobawerî felsefeya mehwî jî ew; bawerîya mehwî ser bi felsefeya tesawifa îslamîye.Belgeya min jî ewe ku ew rêzika helbestê qala destgirtina ji cîhanê û xwedaye. Dest û qeder a xwedaye pişt guh xistina aqile, eşqa xweda nasîne....hwkd... Mehwî bi xweye.

### 2.1.2 MehwîDinava Tesawifê De

Bê goman her çi qas me got; *((Tesawif – Sofîgerî - Mîstasizm derîyê cîhanekî xolqênere û li me vedibe. Ev jî dinava heyîna tesawifê de ev firehî heye. Eger em temaşeyî dîrokê bikin emê bibînîn Tesawif tenê a îslamê nîne belku pêşîya îslamê, xiristîyantîyê û musewetîyê jî her hebûye))* [36]. Li gel hatina ayînan jî corek û bergekî li ser şêweyekî wergirtîye. Li gorî bawerîya wan peyda bûye. Lê belê armanca hemu tesawifan yeke wekî

[36].Mela Ebdulkerîm Muderîs, *Dîwanî Mehwî* , Muhemedî Mela Kerîm, , Çapxaneî serdem , Çapa dw, r 56 2003.

gehiştina (Şhud) (Dîtina heyîna Yezdan), (îrfan) nasîna heyîna Yezdan û bawerkirina bi hebûna Yezdan.

Eger ev armanca tesawifê be bê goman dîrokek gelik kevin jî heye. Ji ber ku di kevinde mirovan li pey xolqînerê cîhanê di geran û dixwestin wî nas bikin. Di xwestin bersiva pirsên (Ez kîme) çi bkim û çawe hatîme? yan jî Çawe ez ê herim bi kuve biçim evan ji hezar yekin bizanin.Pirsyarên din jî wisan bi mirovan kirîye ku bi goman bi ser tiştan de biçin û bi asanî ji rastî û xeletîya tiştan bawer nekin. Bi xwe fikra hemu tiştên li ber destê wan û devê wan kirîye. Rêya tesawifê jî heman tişte. Ew jî her ji kevinde heye û heye.Lê belê cîyawazîya her serdemekê cîyawazîya li gel yê pêşîya xwe cudane. Heta her ayînek jî ji hev cudane. Dinava her ayînekê û her terîqetê de jî rêyên cîyawaz hene. Her rêyek û grupek jî li ser şêwazê bawerîya xwe rêkdikevin û diçin.

## 2.2 Mehwî û Tesawifa Îslamî û Rêbazên Cuda Cuda Yên Tesawifê

Mehwî bi koka dînê şerîeta îslamê û rêya terîqeta Tesawifê girtîye. Ew jî em bi vêdizanîn ku li ser şêwaza rêya yara pêximber çûye, di van her du rêzikan de dibêje:

*Rêge xwda terîqe tî Eşqe we mehwya*

*Wern u pyabron u (selu al al rsul)*

*Her em Terîqebû be hemu sehbî girtîyan.*
*Rûyîn pîyan heta geyne mertebeî û sol.* (d.m.r.250)

Mehwîdi van her du rêzikan de eşkere dike ku ew rêya bi rastî dizane û ji xwe re girtîye di xwaze em jî wê rêye bi girin. Qesîdeya (behrî Nur) jî pesindayîna pêximberê îslamê rêbaza yar û yarane. Ev jî belgeyeke ku mehwî şerîeta îslamê paş ne xistîye.Ewa ku mehwîdi xwîne hinek dijî bawerîya tesawifan bû. Di hinek rêzikan dehebûna bawerîya terîqetê derdixist.

### 2.2.1 Mehwî Ji Ehlê (Hedîp) e Ser Bi Bawerîya Eşarî Ye

(Ehlê Hedîp): Rêbaza vê koma bawerîya di quran û hedîsê de hatîye bê kû bê lêkolîn jî. ((Eşarîyan jî di destpêkê de haman bawerî heye)). (şêx Hesen Eşerî) Rêberê wane.Lê belê her bi vî miqamî sitiranê vê bawerîyê bi wan dida xwendin. (Ahl Alsne û Alcmae) Mînakên helbestên mehwî jî hene ku heman bawerî heye.

Hemu ev helbest jî fermanênpêximber û qurana pîroz jî tê de hene.Ser bi vê beşê bawerîyê ne dibêje:

*(ahmad) ke ekmalî beşere lem meqameda*
*Rutbey kemalî ecazî le (la ehsî) ye ewm*
*Pes mn ke kemtirîn dwa ommetî ewim.*
*Çîm û Çi qurbikem besera çî bikem beyan* (d.m.r268)

Bawerîya Mehwîdi virde ehlê sunet cemaet û eşaîrîye ku dibêje: (Pênasekirina xweda bi kesê nayê kirin, kes nikare bi çi şêweyî pênaseya xwedê bike). Mehwî jî di vir de dibêje: (Ez çîme ez qala te bikim, qala çi tişta te bikim û bi çi qala te bikim). Divê parçeya helbestê de berê xwe daye yezdan. Ev jî di rêzika serî de gotîye. Di rêzika yekem de.

### 2.2.2 Mehwî Terîqeta (Mewlewî) û Bawerîya (Mewlena Celadînê Romî)

Wisan dibe (Ez di derdê bê tu me heta hetayî, serxweşim min navê ez divê serxweşîyê de xeyalên te bikim. Ji ber ku dizanim divê serxweşîyê de bê agahîme ezê wê rojê bi agahî bim heya ku tu werî). Eger wisan jî be mehwîdi wirde bêje *((Ez ewqasê ji durî te serxweş dibim ew qas bi amadebûna te û dîtîna te serxweş nabim. Heger tu li cem min bî ezê behîvan bixwim bikeyfxweşî û bi amadebûna te ezê dîsan keyfxweş bibim))*[37]. Şayenî gotinê ye ez di vir de bêjim dizanim ev rêzika beyta mehwîye. Ji ber ku Mehwîdivê rêzikê de lêhurbûn kirîye. Wisan lêhatîye ku ev rêzik dikare bi çend şêweyan bê lêkdan. Her şêweyê lêkdanê jî rêzik mezintir kirîye. Li gorî min ev başe ez bêjim (Dr îbrahîm Ehmed Şivan) di nameya xwe a Dr de ya bi navê Helbestên ayînî û sofîgerî di helbestên kurdîya Mehwî d)

[37] . Raxb Asifhanî ,Hsîn Bin Mhimd , *"Tircme û Tihqîq Mfirdat Alfaz Qrrirn Krîm ",* Tircmey Xlam Rza Xisruy Hsînî , Antişarat Mirtçuy, Tihran1375.

lê mixabin vê rêzikê bi xeletî lêk dide.Dikarim bêjim paya rêzikê û paya Mehwî anîye ser sifrê. Evê rêzikê wiha lêk dide wiha gotîye: (Ji ber ku Yezdan li ber dil û çavê Mehwîye ji ber wê Mest buye).Ew jî dibêje: (Divê beytê de zaraveyê (Hîçûr) û xomarî (Sikr) tê deye ku beytê bi hêz dike û dixe xaneya bêhişa sofîyan).

### 2.2.3 Mehwî û Terîqeta Neqşîbendîyê

Di nava terîqeta Neqşîbendî de a rast ewe eşqa xweda dema ji ber vê eşqê êşê dikişîne nexweşî ser yek bên. Nabe ji ber êşan û nexweşîyan dest bi giryanê bikî.

Nabe xelkê agahdar bike ku bizane ew êşa terîqetê dikişîne. Di neqşîbendîyê de dema zikratê û tehlîlê de nabe tu hewar bikî. Bawerîya wan jî eve Heskirina yezdan ji dil û deronî be veşartîbe. Ji ber vê jî di terîqeta neqşîbendî de zêdetir berê xwe didin dil. Bê goman em vê jî dizanîn Mehwî jî ser bi vê terîqetê bû. Ji ber ku Mamosteyê wî (Şêx behadîne) dinava dîwana wî de jî herî zêde helbestên wî ser bi terîqeta Neqşîbendî bû. Mehwîdi rêzika xwarê de bi eşkere qalawê dike nabe aşiq dinava aşqê de dinava êşê de dest bike bi qêrînê.

*Perwaneyek be bilbil wa wit ke (Biwalxizul).*
*Sutane îş ehlî mehbet, nehule hul.*
*Çawy le wedî kaştnî min Çawy di kul*
*Xun karî wa debê le qisey voy neka ni kul*
*Bem esxtsase sery min bo negate arş*
*Hat u le sermîda wtî:(ebde bîma yul )* ( d.m.r.248)

Di vir de Mehwîdibêje: (Eşqa rasteqîne ewe ku tu dinava wê eşqêde bi şewitî û deng jî ji we neyê. Mînaka vê jî perwane ji ber eşqa Çira agir berdide xwe heta di şewite deng jê nayê). Eşqa rast ne ewe ku bilbil xwe dike eşiqê gulê. Di çe ser lîs destbi hewar û huryanê dike û hemû xelkê agahdar dike ev jî ne eşqa raste. (Belku tenê xwe vala derxistine). Di rastî de Mehwî bi poxtî vê radigihîne aşiq ewe bi şewite deng ji xwe neyne wekî perwane. Ev jî pesindayînekî gelek ciwan a aşiq û eşqê ye di terîqeta nexşîbendîyê de. Lê belê pêwîste em vê jî bêjîn Mehwîdivê rêzikê de qala eşqa deronîya bilbil û hurîna xwe dike. ev jî amajeya terîqeta qadire. Ji ber ku di terîqeta qadirî de zikra wan bi dengê bilinde ((و (الله الله) و لاالة الاالله)) hewar hear dike û ji çîna bilindin.

Qirig denge, ev jî dîyar dike ku li gorî Mehwî eşqa wan raste. Belku terîqeta wan baş û ne rastbe.

### 2.2.4 Mehwî û Cabrîyet Bawerîya Cabrîyan

Cabrî meshebekî ayînîye. Bawerîya wan jî ewe li gorî wan hemu tişt ji xwe rudidin bê xwesteka mirove. Hêz û îradeya mirovan nikare buyeran bi goherîne. Ew ji hemu tiştan digihîne hêzekî bilind ku ew jî Yezdane. (Mehwî jî di derbarê qeza û qederê de heman bawerî cebarîyan hebû. Mînak divê rêzikê de dibêje:

*Kutirî dil çengulî bazî qeza yanî mojeî.*
*Dê bezolf çu penaba kewte nêw dawî bela.*
*Weqtê nwêjî ser jenazey bo şehîdî bo şehdî eşqdost*
*Mewj eda em asmanane le dengî alsela* (d.m.r.60)

Eger em vê rêzikê runî bikin remz û sembûla mehwî derdikeve. Dema dilê min hîs kir buyer wê were ez xwe jê didim paş û xwe jê rizgar dikim. Lê belê dîsan serkeftî ne bû vê carê di rîya din de buyer bi ser wî de hat. Ji ber ku ev qeza û qedere wê her bi serê wî were. Di destê te de nîne tu xwe jê bidî paş. Bê goman ev jî eşkereye qala bawerîya cebralîyan dike û dibêje: (Xwestek, hêz û îradeya mirovan nikare buyeran bi guherîne). Her wiha her wekî bawerîya cebarîyan divê rêzika xwarê de dibêje: Cebrayî dibêjin: (Her bi fermana yezdan bu her du cîhan avabû qet tiştek ji derveyî yezdan bandorê li ser yezdan nekirîye. Da ku neçar bike vê cîhanê ava bike). Mehwîdibêje:

*Qseî Mayeî xiroş Nîştîn e.*
*Du alim neşe coşale bîbe menşe.*

Mehwîdi vir de bê goman û bê du dilî dibêje: (Ev her du cîhana hatî ava kirin tenê bi gotina dev û lêva wî bûye. (Xwesteka wî Yezdane). Êdî ez naxwazim biçim dinava vekirina behsê de ji ber ku (Mehwî) û terîqetên cuda meseleyên berfirehin.

## 2.3 Mehwî û Felsefeya Tesawifê

Eşkereye ku Mehwîdi îfadekirina bawerîya tesawifan bi rêzikên helbestê tevlihev dike. Em hest bi dijî bawerîyan dikîn di felsefeya tesawifê de. Mînakên wê jî di helbestên wî de zêdene û cihê xwe jî heye. *(( Ji yekîtî buna İbn Ereb bawer dike. Di cihek din de jî ji vê dur dikeve me berbi têkçûna Mensorê helaçve dibe. Lê belê di hinek cihan de ji wê jî dur dikeve. Me berbi (Yekbuna) İbn Ferac ve dibe))*[38]. Gelek caran jî gelik nivîskar û rexnegir dibêjin bawerîya Mehwî ser bi bawerîya eşaîrîye.

Der dikeve holê ku bawerîya wî bi (îmana Aqil) nîne. Pişta xwe dayîyê û ne xwestîye bi rîya aqil berbi îmanê ve biçe. Belku dijî wêye ev jî kirîye bawerîya xwe tenê bi dilbe û zanîye ku îmana tesawifê pak û raste.
Ez ê di vir de herim dinava dîwana Mehwî de. Bi rêya rêzika helbesta jor û fikrên jor ez ê pişta xwe rast bikim. Her helbestên Mehwî ez ê bikim belge.

## 2.4. Mehwî û Yekîtîbuna (Eflatonî) Yan (İbn Ereb)

**Dema em dibêjin Yekêtîbun raste rast sê tişt dikeve mejîyê me:**

**Yekem:** Hindistan, li gorî wan hemu gerdun ji (Birahma) ye.

**Duwem:** Eflaton jî bawerîya wî ew bu yezdan û gerdun yek tiştin.

**Sêyem:** İbn ereb her ew yekêtîbûne bi temamî rêk û pêk kirîye û kirîye Felsefeyek nu. Ew ji bawerîya wî ew bu gerdun di zivire ji bo (Yek) (Yezadan) Yezdan jî di hemu gerdunê deye. Ev bawerîya felsefeyan heya demekê cîyawazî di navbera wan de heye.Lê belê pirsgirêkek dinavbera wan de heye ku her sê bawerî (Yekêtî bûne). Lê belê cor û çawenîyek dinava tesawifê de der dikeve holê, dema ku ev rudide hest dike sofî yan morîd bi gihe meqamê (fena) yan Beqa. Ev yekêtî bun dinava helbestên Mehwî de heye. Mînakên temamî rêzikên wî xezelin. Mehwî qala vê yekêtîbûnê divê rêzikê de dike û dibêje:

*Çi xeyalêke lîqa bê fena çûnî cesed.*
*(Ta pirîşan kar bisamn nrsid).*

---

[38] . Mihemed Zexlul Selam, *"Bê Navnêşan"* Elnaşir Menşa Elmearif Eleskenderiye, Bê Çap, r 34, Elqahire, 1981,

*Her dilê pêwe nebê dax u xetî cêdemy têxa*
*Dewy eşaî bê dewybê mor u send* (d.m.r.149)

Lê belê tiştek heye gelek caran wisan bi dike lêkdana têkçûna helac û yekîtîbunê em tevlî hev bikîn. Divê xezela Mehwî de bi taybet ew rêzika serê yekem rêzika xezelêye zêdetir têkçûna helac cuda dike ne yekêtîbûn.

Dinava têkçûna helac de em digihin rêzika duwemku ew ji bi farisîye. êdî fikra me diçe ser wê ku ew ne têkçûne belku ew (Yekêtîbûna İbn Farçe).
Di vir de tenê ezê wan rêzikan bigirm dest tenê qala Yekêtîbûnê dike. Di rêzika heştem a xezelê de dibêje:

*Her kes çawî clîwe minewer bubê.*
*Kes keî bête never dîdeyî pir bê leremed.*(d.m.r.152)

Di vir de bi eşkere Mehwî dîyar dike Yekêtîbûn rastîye. Ewê bawerîya wî pê neyê jî ew kesên nezanin kurin. Ew dibêje: (Her kesê li gel Yezdan yekgirtî be tîrêjên yezdan ew girtîye. Her hest nakit xelkê din bibîne.Mehwîdibêje: (Her kesê ku nura yezdan da çavêwî) Yan ji dema temaşeyî her tiştî bike yezdan bê li ber çavêwî. Lê belê têk bîbîne û çavên wî tijîbe ji derdan kurbe, baştire ew heqîqetê bibîne. Piştre di rêzika dawîde her heman tişt dibêje:

*Mehuya ba bes şirîkî teşebus bem û bew.*
*Bigire bes damenî tewhîdî (هو الله احد).*(d.m.r.152)

Ev jî ji xeyrî bawerîya (Wehmayan) cihê xwarinê û duakirinê ji xwe çênabe belku ev hemu bi yezdan çêdibin. Lê belê giştî helbestên tezê qala yekitîyê dike armanca wê ewe ey mehwî ba çîtîr em û ew.

*Xew ezanî nîye deywit binum bîme xewt.*
*Nêk bextim be wenezê eî bexte meded.*

Ev jî ji xeyrî wê ev rêzik buye belge ji bo Mehwî ku ne gehiştîye pileya (Fena). Dema ku ew bi xwe jî dibêje ez na gehim vê xwenê xwewa min nayê. Her çiqas dibêje ez nivistim û ez ê werim. di vir de xwesteka wî a li ser (Xwê ) Fenane.Lê belê di rêzikê de jî her xwesteka wî yekêtî bûne. Eger fena hebuna wî bigire ew bi xwe jî jê vedibe êdî ez û ew namîne hemu dibin yek. Mehwîdi rêzika şeşema xezelê de eşkere dike ku hemu gerdun yezdane û bes.

Yekêtî bun bawerîya wan a bi hebunê bi temamî radigihîne. Zaravayê wan jî zaravayê felsefê ye.

*Xeyrî wehdet le cudanye kesert mehme.*
*Sade tekrarî yeke menşeî ew hamî eded.* (d.m.r.150)

Dibêje (Hebun tenê yeketî û yeke. zêde kêm û rastî tê de nîne). Pey xistina yek xistina ser yek hejmara yek her hejmara yeke çavkanîya hemu jimaran.

### 2.4.1 Mehwî û Yekêtî bûn a İbn El Ferac

İbn Ferac di bawerîya yekêtîbûnê de cîyawaze ji bawerîya helac. Têkçuna yekêtîbuna ibn Ferac ji encama (Yekbun, du heqîqet û yek heqîqetê) pêktê. Lê belê têkçuna Helac jî ji (Ji heqîqetekê biçe dinava heqîqetek din û xwezayîy xwe winda neke) pêktê. Mehwî jî ji yekêtîbûna İbn Ferac bawer dike. Di gelek cihan e ewî jî heman tişt gotîye. Mînak; Di yekemîn rêzika xezela pêşîya wî de gotîy:

*Çi xeyalêke lîqa bê fena çûnî cesed.*
*Ta pirşan nşûd kar bisman nsrd.* (d.m.r.149)

Ev jî ew têkçûna di nava laşdeye ibn Ferac dibêje: (Heqîqet biçe dinava Heqîqetê). Laş jî pêwîste di nav de biçe, ev jî ew deme ku bigihin meqama fena.

Heqîqet li gel fena çûn, pêwîste dîsan çêbibe. Li nav çûn yan tevlîhev bûyîn, na gyan yekgirtin, yan yekbûnî beramberî du heqîqete. Weku di nîvê rêzika farisîde jî dibêje: (Heya ku tişt xirap nebe na gehije ew encama wêneyekî nu jêre peyda bibe).

### 2.4.2 Mehwî û Tekçûna Helac

Helac na gehe meqamê fena. Her ku dikeve xirabûna deronî rewşa wî tê gohertin û bê hiş dibe. Kengê Helac têkçuna xwe zêde nivîsîye a herî zêde dinava helbestan de qala fena bunê dike. Ji xeyrî vê jî Mehwîdinava çend rêzekê de navê Mensorê Helac anîye û bi heq datîne.Mehwîdivê rêzikê de qala fena bûnê dike.

*Ke dil detwête bo to, dekae awroje to brwa*
*Ke xot derxe weku xor dil wekw şawnem laxo brwa*
*Ke ruhim têgeyî tu hez bederçûnî dekeî, derçû.*
*Debê aşqke dî bêzare yarî bê birû birwa.*
*Witî Mehwî mn û tu aftab û saye tîmsalîn.*
*Cenabî mn ke derkewtim debêteşrîf tu birwa.* ( d.m.r.67)

Yezdan wekî tîrêjên rojêne, ez jî wekî sêberême. Eger tîrêjên rojê jî derkeve li sîberê bide sîber jî namîne û xilas dibe. Ey xudawû ez ewqas evîndarê teme ew qas ji derketina te û dîtîna te di tirsim. Lê te bi xwe got, eger ez xwe nîşana te bidim tu êdî namînî. Ev jî fenabun û têkçûna helacîyane.

*Ke ruhim têgeyî tu hez bederçûnî dekeî, derçû.*
*Debê aşqke dî bêzare yarî bê birû birwa.*(d.m.r.68)

Eger di vir de xwesteka mehwîdi (Rih derketin) Berjengê mirovan bê ew jî heman têkçûne. Ey xwedawo dema nefesêya mirovên mine, min fêmkir tu ji wan heznakî dinav min de bimînîn. Tu jiwan aciz bûyî ji ber wan te ayetji cem min avêt. Eve ew bi xwe jinav min derketin ne man. Tenê tu hej ji nemana wan dikî de bêje eşq ewe. Eger di rêzikê de xwesteka Mehwî (derketina ruhê) meye. Dîsan xwesteka wî rêzika Fenane. Bi rastî ev rêzika mehwî ew qas di payekî bilindhunerî û tesawifî deye.

### 2.4.3 Mehwî û Dijyayetîya Wî Beramber Bawerîya (Muetezîlî û Cabrîyan)

Mutezî hemu tiştan didin destê azadîya mirovan. İbranî jî hemu tiştan bi Yezdan ve didin girêdan. Mirovan jî wekî akterekî şano dibînîn ku li ser dikê dleyîzîn nabin ji rolê xwe derkevin. Lê belê mehwî li dijî herduyane (Mîyanrewe) wekî dibêje:

*Xalîq yekêke kasîbe ebid em per ew pere.*

*îfragî îtîzalî yutefrîgî cebrîyan.*

Di vir de mehwîdibêje yekî çêker heye, her ew çêkere mirov çêdike û hemu tiştî çêdike. Lê belê ew mirov jî rolê xwe heye di çêkirinê de.

### 2.4.4 Mewî û Rabîey Eddedî

Rabîey edewî ev jine piştre zivirîye ser eşqa yezdan, buye serdestê aşiqan. Rabîey Edewî wisan nebe belku bawerîya xwe ji mehwî wer girtibe.*(( Gel sofîyan jî tişt girtîne. Rabîe di derbarê bawerîya xwe a binav û deng de dibêje))*[39]: Ey xwedawo ez te diperêsim ne ji tirsa cehnemê ji xweşîya cenetê, belku ez evîndarê teme û dixwazim te bi perêsim. Mehwî jî di gelek tiştande heman tişt gotîye. Eger ez ji agirê Mehbetê şikbim, agirê cehnemê bi heşta mine. Cenetê ez ê bikim heram Ey Xudawo eger heskirina te li cehnemê be jî ez herim wirjî. Cihê herî dawî tu lê diminî ji min re beheşte. Min ne beheşt ne jî cehnema te navê, tenê min eşqa te divê. Ev alî û ew alî girtîye rastî jê wenda bûye. Ev û çendek din jî di helbest û bawerîyên mehwî de derdikevin holê. Lê belê ewa ku min divir de dayî destnîşan kirin tenê min dixwest bê zanîn ku mehwî çiqasê dinava  felsefe û feslsefeya tesawifê de maye û zanîna wî heye.

[39] . Rizgar Şêxanî *," Êkêlof û Karîgerî Nax"* , R(Hewlêr) , j(823) , 14_Temûzî_2010.

### 3. Ji Dîwana Mehwî

*Fisaneî min buwe zîneî mecalîs aferîn ey îşîq.*
*Çeha bê nam û xamî wek mint kirdute sahibî nam.*
*Be eret lew gul endame kewa bada mye Çawî*
*Dily nazik weku gul memroq wekt wêki badam*
*Bna goşî le Çînî zwlfî derketbu detwt*
*Eme baze spî subeh Çwe ben bali zaxî şam*
*Be mehwî kê xeber da bo sefer Çu ew dalale*
*huÇumî xem be carê hat u ykser bary krd aram* (d.m.r.259)

(Ey aferîn bu tu eşiq) Ji ber teye çîrok û macerayên jîyana min buyîne kakilê babetên cîvîna xelkê. Caran kesê ez nasnedikirim ez kesekî sade û ne navû deng bûm. Dîsan hezar aferîn ji tere eşqê ku te ez bi xelkêdam nasîn. Ev jî yek ji wan rêzikane ku mehwî tê de spasîya eşqêdike.

*Reqîb derke,em berderke pake pîs eka fermûî:*
*Ke berbem qapea lazim sagêkî waye bu birwa.*(d.m.r.68)

Aşiq û bedkarê liber derîyê mala meşuq dîtîye. Dilê wî êşaye ew dizane ku meşuq li gel kar li hev kirîye. Belku aşiq ji meşuq bawer dike. Meşuq gelik ji wî pîroztir û paqijtire. Ji ber vê jî maşuq gotîye ev bedkarê kesan derdixe ji bober derî pîs nebe. Di vir de me-aşuq ew qas dilê wî paqije na xwaze dilê berkar jî bişkîne û wan der bixe. Ji bo aşiqê wî beraberî çi pirsgirêkan neyê dibêje: Tu dilê xwe ne hêle vaye tu dibînî ev bedkare wekî seyekê li ber derîye. Te çi kar bi wî heye? Jê gerê bila here...?

*Lêwy her hate qse rohim Çwe*

*Bo swealî min belê rohe cewab*

*Ezyetim kemtir deda darojî heşer.*

*Zorî ranegirin legel min bu hîsab*(d.m.r.78)

Nizanim di virde ew meşuqê ew qas dilê fireh ji ber çi hatîye guhertin. Berê xwe ji eşqa xwe zivirandîye. Vaye eşqa wî hewar dike û dibêje: Niha ew ji bo êşdana min jî nayê li cem min. Ew ditirse ez ji ber van êşan bi mirim. Di tirse di roja heşarê de ez daxwaza xwîna xwe û heqê xwe bikim. Ji min bi pirse kê wisan bi te kirîye û meşuq jî dibêje qey ezê tilîya xwe li cem wî ve bikim.

*Rame heta ta bu segêk wek reqîb.*
*ew cenabe her leminye îctînab* (d.m.r.79)

Tê dîyarkirin ku meşuq piştî wê xwe jî eşqê dur xistîye. Êdî xwe nîşanî wê nade rast çûye cem bedkarê dijber ê wekî seyan. Li gel wî bi hev dike û aşiqê wî jî ji xwe re dibêje di be ku xwe ji min dur xistibe. Ew ji wiha di fikire ku ji tirsa reqîb ji eşqa xwe dur dikeve.Ji ber ku ew dizane eşqar wî çiqas ji wî hes dike çi bi wê bike jî ew litola xwe na gere.

*Şûkir tu le fikrim naçî, eger çî min le fikrit çume.*
*Le min xayab ne be tu, besme mn le tu bim xayab.*
*Dezanem rojê ew min şekeÇy pêşm delê mehwy*
*Hezwry ger hebê xwahî , miş(hafiz) azuxayb* . (d.m.r.84)

Meşuq wekî çû êdî lê nezivirî. Hêvîya eşqa xwe jê birî. Eşqa wî jî zanî êdî bê bawer bu dîsan li eşqa xwe bizivire. Lê belê dîsan bi wê eşqê jîyan dikir ji ber ku dizanî wê eşqê ji bîr bike êdî nikare jîyan bike. Meşuq ew ji bîr kirîye belku eşqa wî wisan bike ku ew ji bîr neke. Eger ket dinava xeyalan de êdî derxistina wê nîne.

*Detirsim gerdî xwênim le şîşey gerdnt nîşê.*
*Weger na xem nîye bimrim le hesret lêwî mîgunt.*
*Ne geme damenî desty dea ca debeme xakî rêy*
*Terîqaey goşe gîry ber dedem emcara rê degrm*
*Ke dady yessî xomim brdde lay emarfe tund bu*
*Wty axr sbeynê cejne xuênî to lepê degrm* (d.m.r.261)

Tê dîyarkirin ku di vir de durîya meşuq ji eşqa xwe gelek hesret kêşaye. Di xwaze daxwaz ji meşuq bike bi zivire.Lê belê ji ber çi? Ji bo çi vê nake aşiqa wî temamî jîyana wê buye xemên durîya wî. Ji bo ji van xeman rizgar bibe ji ber wê daxwaz ji meşuq dike bizivire. Aşiqa wîdixwaze meşuq bizivire ji ber ku ez ditirse wî nebîne ji xeman bi mire.

*Reqîb seg hazî bu koştimt seyrî ke çunî bûm.*
*Dua bu dest û têxt mn dekem birwane çunm bût.*
*Bexedarî ne wek nawit bern bime necnî qet min.*
*Şikatî cewrî tu berkes debem birwane çunim but.*
*Henaseî agrînîm birdewe ber ta derunim sut.*
*Benale ta dilt sexlet nedem birwane çunim bût.*( d.m.r.110)

Tu çûyî her ew çûyîna cem reqîb. Her ew jî ne bû te ez kuştim temaşeyî xwe bike ka bizane ez çawebum. Te çiqas tiştên ne rast diderbarê min de digot lê dîsan jî min duayên başî ji tere dikir. Ez hêvî û daxwaz dikim qet nexweşîyek ê te nebe. Min qet tiştên xirap di derheqê te de ne gotîye min hertim daxwaza tiştên başji bo te kirîye. Erê ev ne nîşan û belgene ji bo ku min nexweşîya te navê? Tenê dema ku tu çûyî û te ez hêlam bi tenê nefesa min wekî agir lê hat. Ji bo dilê te ne rihet nekim û min wisan nekir tu bizanî min xem heye.

*Xemî xoşî nîye (Mehwî) le dilya her xemî tuye.*
*Le îşqît da dekem xem bu be xem birwane çûnim bût.*(d.m.r.111)

Ji vê tu bawer nakî ku tenê ez xemê ji xwe naxûm, lê dinava dilê min de tenê xem xwarin heye. Vaye ez ji ber eşqa te hemu van xeman perwerde dikim. Belê ma ev hemu nabin cihê bawerî ez li bîra teme?

*Besurme buye dolber xencer mûjganî da perdax.*
*Dilî helnagirê bibînî le kuşte dengî nuf ax.*
*Be tîrê kuştmy , helya we sîm sutane my roy*
*Dwa bo hîfzî en dîwe canane wa gustax*
*gul u laley kej u kokohen dênête wefikrm*
*ke xunî na heqî ew merc eda êsteş le kêwr şax* (d.m.r.142)

Aşiqa wîdibêje: Ev hemu êş liser destê teye, lê ez tiştekî nabêjim qet deng ji xwe der naynîm. Navê te jî bi xirabî nabêjim. Dema tu êşê didî min. Belku tu dibêjî cîhan hemu wisaye lê nizanî tu êşê didî kê. Tu hinek caran karên wisan dikî aşiqa te ni kare tiştekî bêje. Ez van tiştan hemu ji ber te dikim lê dengê te qet nayê. Belku ev hemu karê teye tu dizanî jî ji ber vêye tu guhdarîya min nakî.

*Birwane sutnim were, birwake min neman.*
*Perwanem îtirm nîye perwa ke min nema.*

Êdî di vir de evîn namîne, hêvîya xwe jê birîye. Hevalê meşuq dişîne cem û dibêje: Were temaşeyî min bike ez wekî destpêkê ne mayîme. Ez jî wekî Perwane lê hatîme vaye ez jî di şewitim. Bila were ez tiştek lê nakim ji ber vaye ez diçim. Dema ez jî nemam ma ezê çi jêbikim.Tenê ji ber vê ez banî te dikim qet tiştek jî nebe bila ez te li ser mergê xwe bibînîm.

*Dîyarim deyrî îşqe çê besutin  bê lewê degrim.*
*Ke min mştî çil be çî bim ke lekî kê dekem.*(d.m.r.260)

Êdî vaye ez diçim, dinava eşqa tede diçim. Ezê êdî hêvîya çi ji te bikim. Welatê eşqa nû ya min welatê şewatê ye. Êdî vaye ez di şewitim tu jî tiştek neke tu jî bi şewtî. Tenê min divê tu temaşeyî şewata min bîkî, divê derfetê de ez jî wê te bibînîm.

*Sibeynê were seyrî kuştin wadem çehadawim.*
*Leser wadeî diruî ew nadem îtîr wade qet nadem.*
*Wtm: ger halî ((mehwî)) tê bgey dem bem hede nakeî*
*Wtî: ew têegeywe min perîm u ebenî adim!*
*Esîr u seydy qeîdî kege wşe ydî nexsy emimarem,*
*Le dest em mare bedÇare Çye Çarm xw da Çarem.*(d.m.r.266)

Tê dîyarkirin ku meşuq çend caran peyman bi evîndara xwe daye. Wê sibê carek din here cem. Piştî çûyîna wî yan wê temaşeyî mirina wê bike yan jî wê bi gehitê hîna xwe ne şewitandîye. Lê belê evînd.

ar vê peyama xwe ne gehandîye cih. Hemu caran evîndara wî çûye cem û dibêje: Sibê ewê were lê ezê temam bibim. Lêbelê nehatin meşuq û ne gehandina peyama xwe, wisan bi evîndarê kir vê carê vê carê dizivire lê  bê hîvî bû. Êdî vê peyamê ji kesekê re nebêje.

*Le çawanim nema bu girye,nûbeî secade berderîye.*
*Sîya salim nebare, nêjî îstîsqa nekem, çîbkem*(d.m.r274)

Tê dîyarkirin ku evîndara wî li hêvîya meşuq maye wî bibîne. Çend caran peyman jê re daye lê belê her ew ne hat. Ji ber vê jî evîndarê bê çare ma dibêje: Min ji ber wî ewqas rondik barandin lê ew nehat. Niha jî rondikê min xilasbûn, çare ewe ku ez herim li ber derîyê wî.

*Dilim derhat tu her dernehatî.*
*Nehatî her nehatî her nehatî.*
*Ke em xende û qsew lêwet hea*
*Lebaty şaker û nuql û nebaî*( d.m.r.342)

Evîndar li ber derîyê mala meşuq sekinîye û hewar dike. Vaye ez li benda teme tu derbikevî. Vaye dilê min derket lê tu her nehatî. Tu ew qas tevlî xwîna min bûyî, dilê min ji singê min deket lê her tu nehatî. Ji ber vê jî vaye ez têm.

*Leser tu duşmine dunya qezîyem (Manh Alcme)e.*
*Ke terkî tum nekem, hemu dunya nekem çîbkem.*(d.m.r.274)

Evîndar ji ber vî karî çûye ber derîyê mala meşuq. Vaye hewar dike û dibêje ez nikarim te ji bîr bikim. Tu ji min re derkeve êdî hemu kes bi vî karî hesîyan. Lê belê evîn dar bi vê jî bersiv nedea û got: Ez êdî nikarim te bihêlim ka çara vê çîye? Pêwîste ez goh nedim gotinên xelkê û dunyayê. Ka tê ji min re derbikevî xwe nîşa min bidî?

*Le Çawanim nemagrya nobey secde be rdeye*
*Sya salim ebare nuêjî estqa nekem Çibekem!*

*Leser tom de şmine dinya qezyem (manh al jemhe)*
*Ke terkî to nekem terkî hemu din ya nekem Çi bkem,*
*Bece mawe le yaran nabê mawmecel zube!*
*Be merdin lemqusurî jîne estîxfar nekem Çi bekem*
*Ewa leyla berojî heşir eda wadeî lîqa (Mehwî).*
*Heta qamî qîyamet, ah û wawîlanekem çîbikem.*(d.m.r274)

Tê xuyakirin ku meşuq serê xwe derxistîye û peyamek dayê carek din hevdu bibînîn. Lê belê vê car got qîyamet rabû min xwe nîşa te didim. Evîndar ruyê wî nebu û gotê: Mawê çi çêbe heya wê rojê belku dilê wî were gohertin û biryara xwe bi goherîne. Lê her tu neyê jî ez ê li benda te bi mînîm.

*Bîbê yan neybê min dad û bêdadî dekem.*
*Gwê bidate ya nedatê ah û feryadê dekem.*

Di virde evîndar bi eşkere dibêje: Ez bi mirim jî ezê karê xwe yê heya niha bikim. Ew hewar û ji te durî hemu ji ber hesreta dîtîna te min dikir. Eger tu goh bidî yan jî nedî lê her ezê bikim.

*Heqîqî îxlase be cêhênanî adabî xolus.*
*Pê bizanê ya nezanî min be dil yadî ekem.*
*Bê squny esqî şîrynêk ezwa hatote pêş*
*Ger le heq bêm û neym teqlîdy ferhadê dekm*
*Qwî têxy wefqe her tuşne le bê ke min ebê*
*Kar ger bê yan bê lem mezle medadê dekem*
*Dersî eşqim her le kin perwalne ya bul bul bwe*
*Bge mîgemê ya negemê her meşaî ustadê dekam*
*Kuştnî esfendyar hefse yeste ray pîr*
*Ger meddka ya neka lew şahe emdadê dakam*
*Bem nizykane le berme ((mehwya)) rêgêkî dur*
*Bête destim ya neyê her koşişî zadê dekem*(d.m.r276)

Ji ber ku ew rêya mine, wekî erkekê li ser milê mine heçîya ez bikim. Ha eger tu bizanî yan ne zanî her ez ê li benda te bim. Êdî ew evîndar li hêvîya meşuqa xweye.Ev çend mînakek bûn ji helbestên mehwî û cîhana tesawif û Îrfana hezretê Mehwî bû. Bi hêvîme me xizmetek biçûk ji be ji bo wêjeya kurdî û hinek xizmet me ji bo cîhana felsefê û sofîyatîya Hezretê Mehwî kirîye. Bi hêvîme me xizmeta miletê kurd kirîbe.

**ENCAM**

- Peyva Felsefe cara yekemîn ji alîyê Fîsa Gorsbekar ve hatîye bi karkanîn (Fîlosofa). Ev peyv tê wateya (Heskirina ji cîhanê).
- Peyva sofî jî hinek dibêjin ji wê hatîye,carnan ee ni xwedaperestî ve mijol dibin cilên sofîyan li ber xwe dikin. Hinek din jî dibêjin: Ji sofya yunanî hatîye. Hinek din jî dibêjin: (Asfe) ya erebî hatîye. Gelek fikrên cuda jî hene.
- Felsefeya Tesawifê ji wê bawerî û rêbazê re dibêjin, zanayên tesawifê û sofîyan bi şêweyekî hur li ser meseleya metafîzîkî bi giştî di sekine.
- Zimanê helbestên Mehwî zimanekî girane û li gel zimanê (Erebî, Farisî, Turkî,...hwkd) tevlî heve. Bi şêweyekî girina helbestên xwe nivîsîye. (Sebik Hindî) Jêre dibêjin, fêmkirina ji armanc û xwestekên wî ne hêsanîye. Xwesteka Mehwî bi temamî nayê zanîn
- Mehwîdinava tesawifê de buye sofî. Sofî jî li ser terîqet Neqşîbendîye. Helbestên wî jî gelek li ser wê cîhanê ye.
- Mehwî piştî tesawifê terîqet girt. Li gel vê jî melayek baş bû. Bê guman wisan kirîye êdî nikare xwe jı felsefeyê dur bigire. Ji ber vê ji di hinek helbestên xwe de fikrên xwe yê felsefîk jî daye dîyarkirin. Lê belê em nikarin bêjin mehwî fîlozofe, ji ber ku ji bawerîya felsefa xwe der ketîye. Fikrên wî hemu yên pêşîya xwe ne. Rêbazekî taybet ne nivîsûe. Felsefeya Mehwî hemu bawerîya felsefeya tesawifê ye.
- Em dikarin bêjin helbestên Mehwî yê serdema wîne. Wateya wan jî carek wî alîyê nîvê ye cara din jî li pişta wêye. Eşqa wî jî îlahî û tesawife. Eger em temaşeyî wateya helbestên wî ê ji derve jî bikîn eşqa wî mecazîye. Lê belê di hemu helbestên wî de ne wekheve.

**ÇAVKANî**


Alahya Elum Aldîn ,*((Mahye Altswîf )),* Çapa yekem, Hawlêr, 2002.

Ebdurehman Bêlaf Berzencî,((*erîqetî Neqşîbendî))*, Çapî duwem, Çapxaneî Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2002.

Ehmed Mihemed Por *,((Felsefe mîtodî le zanîste Miroyîyekanda)),* Seîd Kake,Çapa yekemî, Çapxaneî Mûkiryan, Hewlêr, 2013.

Emîn Şêx Eladîn Nexşîbendî,((*Tesawif Çîye*?)),Çapî duwem, Çapxaneî Jîn, Silêmanî, 2002.

Hadî Mihemedî,((*Felsefey Mîtodî*, Çapxaneî Bînayî, çapî Yekem)),Çapî duwem, Hawlêr, 2006.

Hemîd Ezîz,((*Bineratîyekanî Felsefe)),*Çapa yekem, Çapxane Serdem, Silêmanî,2015.

Hesen Emîd Thran,((*Ferhengî Farisî)),* Çapa yekem, Çapxaneî Sçhr,Tahran1382.

Ibn Xaldun *,Muqeddîmat Ibn Xaldun,* Tbeh lcnha albyan Al erbî, Qahêra, 1975.

IZESDDÎN MISTEFA resûl,lêkolînewey *Edebî folklorî kurdî,* weşanxaneya Aras ,ç.3 hewlêr, 2010.

İbn Qasm Alqşrî,((*Alrîsale Alqşîrye Fî Elm Altswf))*Tbeh lcnha albyan Al erbî, Qahêra,1987.

İbrahîm Ehmed Şiwan,((*Sofîger))î,* Çapxaneî Wezaretî Perwerde, Hawlêr , Çapa yekem, 2001.

İbrahîm Mihemed Tirkî,((*Ma alflsfe))*, Dar alwfa ldîn algbae walîşr, Alaskndrîe, Cmhurye Almsr erebye, 2007.

Marif xeznzdar,((*bo biray biray berêz ebdulla peşêw, ko . karwan, jimare ))* ,Hawlêr 1998.

Mela Ebdulkerîm Muderîs, Muhemedî Mela Kerîm,((*Dîwanî Mehwî))*, Çapxaneî Ofsêm hsam, Çapî duwem, 2003.

Meskîf Xalîb,((*Dîkart talîf*)),Fîsbîl Musue Flsfe, Mnşurat Daru mktbî alhîlal, Byrut Lûbnan, 1982.

Mihemed Zexlul Selam*,"Bê Navnêşan"* Elnaşir Menşa Elmearif Eleskenderiye, Bê Çap , Elqahire, 1981.

Msgîf Aşrfî,((*Dîwanî Hafz Şîrazî))*, Çapî Pêncem Çapxaneî Azadî, Taran1374 .

Msgîf İbrahîm Alzlî,((*Felsefe Alşerîye))*Çapî duwem, Hawlêr, 2006.

Raxb Asifhanî ,Hsîn Bin Mhimd *,((Tircme û Tihqîq Mfîrdat Alfaz Qrrirn Krîm)),* Tircmey Xlam Rza Xisruy Hsînî , Antişarat Mirtçuy, Tihran1375.

Rizgar Şêxanî *,(( Êkêlof û Karîgerî Nax))* , R(Hewlêr) , j(823) , 14_Temûzî_2010.

Soran Ehmed heme , ((*Komarî Eflaton)),* Le Îngilîzîwe ,Rêbiwar Qaramanî,Mehdî Hesen Çoman, Çapxaneî Wezaretî Perwerde, Hewlêr,2006.

Stanlî Hêmin, *((Alneqd Aledebî we Medaris Alhdes)),* Tercumet Ehsan Ebas- Mihemed Yusif Necim, Mueseset Franklin Almusahemet lil Tibaet We Alneşir, Qahêre 1999.

Şaho Osman Nêwendî, *((Binemakanî felsefe, Dîkart*, Roşengerî bû lêkolîneweî fikrî û Sîyasî)), Çapî yekem, Hewlêr 2015.

Şêx Nedîm Csr û Nure Ebdula Salih,((*Dastanî îman))*, Çapxaneî Bînyaî, Çapî yekem, 2003.

Zerînkub Ebdulhusên*, ((Neqdê Adebî)), Çapxanaya* Emîr Kebîr Çapa Çaram, Têhran 1369.